

## Efrîn û bedewiya jinan

Di çaryeka sedsala 21'ê de, jinên kurd di şexsê YPJ'ê de li rojavayê Kurdistanê û bakurê Sûriyeyê, li dijî çeteyên DAIŞ'ê yên hovber; şerekî bêeman kirin. Berxwedan û çelengiya jinên kurd a xwe rêxistinkirî, bû îlhama jinên dinyayê... ***Leyla Lorîn / R.2***



## Hemçaxê Xanî nivîskar La Fontaine

Château-Thierry, bajarokekî biçûk ê bi ser bajarê Aisne yê li herêma Hauts-de-France ya welatê Fransayê ye. Li vî bajarokî helbestvan û nivîskarekî bi navê Jean de la Fontaine di sala 1621'ê de hatiye dinê ku li dû 400 saliya... ***Yaqob Tilermenî / R.5***



## Malên kerpîç ên Rihayê

Riha... Bajarê pêxemberan. Warê şaristaniyên qedîm, destpêka xebatên zanistî... Wexta mijar dibe bajarê Rihayê mirov dikare behsa gelek taybetiyên wê yên xweser bike. Gelek cihên wê yên kevnare hene... ***Bêrîvan Karatorak / R.11***


# xwebûn

13-19 ÎLON 2021 HEJMAR: 91 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org


## Ziwano nêzanayene

Yew ziwan bîyarêne vîrê xo. 3 hezarî ra zêde merdimî no ziwan qalî kenî û hezaran km de cuyenî. No ziwan de bi hezaran çekuyî estî û kitabî yenî nusnayîş. No ziwan bi vengê xo rengê xo tebîet ra girewto. La nêeşkeno texma xo û rengê xo bido tebîet. Ziwan seba dar o. Na dare ça de awe bivîna ristimê xo weyrê ra derg kena. Çend ristimê aye pîl bibî, gilê aye zî derg benî. Dar bi kokê xo û bi gilê xo bena dare. Ziwanê ma zî seba na dare bi ristimê xo û bi gilê xo pîl bîya, vil girewta û bezreyê xo vilayê her cayî kerda. Şima eşkenê na dare ra vajîme... ***Cemîle Turhalli / R.9***

## Lûtkeya Bexdayê

Beriya ku em behsa naveroka konferansa dewletên cîran an lûtkeya Bexdayê ya hevkariyê ku di 28 tîrmeha borî de hatiye lidarxistin bikin, divê em behsa konferansa 'hevbendiya Bexdayê' ku di salên 1950'yî yên sedsala borî de hatiye lidarxistin, bikin. Nemaze armancên her du konferansan ew e ku ji bo Rojhilata Navîn û li herêmên em li ber deriyê îmzekirina hevpeymanên nû ne û bi taybet li welatê Şamê pêvajoyekê bidin destpêkirin. Diyar e çarenûsa lûtkeya Bexdayê ya Hevkariyê heman çarenûsa Hevbendiya Bexdayê ya salên 50'yî yên sedsala borî ye. Ji ber ku dewletên... ***Serdem Silo / R.7***

## Li Rojhilata Navîn planên nû

Li Rojhilata Navîn pêşveçûnên pir girîng tên jiyîn. Ev hevdîtinên dîplomatîk îşaret bi pêşveçûnên nû dikin. Wisa diyar e ku wê ev hevdîtin bidomin jî. Di 28'ê tebaxê de Bexdayê ji civînek girîng re mazûvanî kir. Di civîna lûtkeya Bexdayê de nûnerên 7 welatan li hev civiyan. Mijara sereke jî ew bû: 'Ka Iraq çawa dikare aram bibe yan jî li aramiyê vegere'. Lê dema me dît ku dewleta tirk jî tev li vê civînê bûye, xuya ye ji bilî aramiyê wê her tiştî bibe. Kongreya Lûtkeya Welatên Cîran, bi beşdariya nûnerên Siûdî, Kuwêt, Tirkiye, Urdun, Amerîka û Fransayê pêk hat. Vê civînê piştî... ***Felemez Ulug / R.6***

# Zimanê dayikê hîmê azadiyê ye

Hesvserokê MED-DER'ê Rifat Ronî behsa xebat û polîtîkayên li dijî ziman û perwerdeya kurdî kir. Ronî da zanîn ku tevî hemû astengiyên li pêşiya ziman û perwerdeyê, kar û xebatên xizmeta ziman didomin û wiha got: "Zarokên bi zimanê xwe perwerde dibin her dem sê gavan li pêş in. Ku ziman tune bibe civak jî tune dibe... ***Hevpeyvîn Medya Bal / R.4***




## Girtiyên nexweş derman nakin

Li girtîgehan mafên girtiyan ên paqijî, tenduristî, xwarin, av, ragihandinê tên binpêkirin. Girtiyên daxwaza mafê xwe dikin, daxwazên wan bê bersiv tên hiştin. Girtiyên nexweş nayên dermankirin û terkî mirinê têne kirin. Komeleya Civaka Sivîl a di Pergala Înfaza Ceza de (KCSPÎ-CÎSST), di meha tebaxê de raporek li ser rewşa girtî û girtîgehan amade kir. KCSPÎ'yê li gorî serlêdanên girtî û malbatên girtiyan dane komkirin û rapor amade kir. Komeleyê ji destpêka şewba vîrûsa Coronayê (Covîd-19) heta tebaxê ji 143 girtîgehên cuda serlêdanên girtiyan û malbatan girtin. Ji 143 girtîgehan 94 girtîgehên sergirtî û 49 girtîgehên vekirî ne. Komeleyê di beşa Kapasîteya Girtîgehan de bal kişand ser hejmara zêde ya girtiyan û... ***R.6***



# Dem dema rûxandina dîwarên Îmraliyê ye

Di serî de jin; gelê kurd rewşa Îmraliyê ji nêz ve dişopînin. Gumanên civakê yên der barê tenduristî, ewlehiya Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan de her hebûn lê di vê dema kaotîk de ew guman hîn zêdetir bûne. Bi boneya rakirina tecrîda li Îmraliyê her roj çalakî û daxuyaniyên jin, ciwan û gelê kurd ên li dijî tecrîdê çi li welêt çi jî li derveyî welat neyên lidarxistin. Helwesta di nava raya giştî ya kurd de ya dijî tecrîdê pêş dikeve 'rejîma Îmraliyê' ya ku niyet dike domandina temenê xwe di şidandina tecrîde de qayîm bike, dixe nava tirs û xofê. Her wiha parêzerên Ocalan ji hêla hiqûqî ve her roj serî li dozgeriya komara tirk didin da ku rêyeke hevdîtinê ya Girava Îmaliyê bidin vekiri... ***Adar Şaman / R.2***

MACID YÛSIF

## Ez ê çîrokeke xweş ji we re binivîsim *R.10*

## Parkînson

Parkînson, nexweşiyeke mejî ye. Ev nexweşî herî zêde li kesên temendirêj ango li kal û pîran peyda dibe. Nexweşiya parkînsonê di sala 1817'an de ji aliyê bijîşkê îngilîzî James Parkinson ve hatiye pênasekirin. Bijîşk Parkinson, nexweşiya parkînsonê wekî 'felca lerzokî' pênase kiriye û paşnavê xwe daye vê nexweşiyê. Sedema derketina parkînsonê tunebûn an jî kêmbûna dopamînê ye. Dopamîn, parçeyeke kîmyasal e û bi awayekî xwezayî di laş de heye... ***Fzt. Mustafa Onal / R.8***



## Kurdên cîhana dêrîn; hattî-hîtîtî 5

...Her îcraetên xwe, bi destên katibên hosteyên jîr, yên hûrrî, lûwî, hattî û hîtîtî qeyd kirine û ji dûhatiyên xwe re arşîveke bêqisûr hiştin. Arşîva wan ew çend tekûz e, di roja me de jî... ***Agît Yazar / R.12***

## 190 roj in li edaletê digere

Emîne Şenyaşar a ku xizmên Parlamenterê AKP'ê yê Rihayê Îbrahîm Halîl Yildiz hevjîn û du lawên wê kuştin, 190 roj in bê navber li edaletê digere. Rayedarên darazê li şûna kujeran derxin pêşberî dadger, doz li Emîne Şenyaşar vekirin. Emîne Şenyaşar dê bi îdiaya 'heqaret li wezîfedarê cemaweriyê kiriye' dê di 12'ê mijdarê de derkeve pêşberî dadger.
Emîne Şenyaşar ji 9'ê adarê ve ji bo 'Edalet' pêk bê û kujerên hevjîn û du lawên wê yên hatin kuştin bên darizandin, dîsa ji bo lawê wê yê girtî Fadil Şenyaşar were berdan bi biryar nobeta edaletê digire. Malbata Şenyaşar 190 roj in daxwaz dike ku bi Serdozgerê Komarê û dozgerê dosyayê re hevdîtin bike. Lê ev daxwaz tê redkirin. Emîne Şenyaşar a ku bi dehan car ketina wê ya avahiya edliyeyê hat astengkirin... ***R.3***

# Heyam heyama rûxandina dîwarên Îmraliyê ye

Adar Şaman

Kengî dîwarê tecrîda li Îmraliyê hat hilweşandin, dê hingê xweşî û kêfxweşî bikeve nav civakan. Aramî û serfiraziya gelan dê bi rakirina diwarên pergala zilmê ya Îmraliyê serwext bibe




Di serî de jin; gelê kurd rewşa Îmraliyê ji nêz ve dişopîne. Gumanên civakê yên der barê tenduristî, ewlehiya Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan de her hebûn lê di vê dema kaotîk de ew guman hîn zêdetir bûne. Bi boneya rakirina tecrîda li Îmraliyê her roj çalakî û daxuyaniyên jin, ciwan û gelê kurd ên li dijî tecrîdê çi li welêt çi jî li derveyî welat neyên lidarxistin.  Helwesta di nava raya giştî ya kurd de ya dijî tecrîdê pêş dikeve 'rejîma Îmraliyê' ya ku niyet dike domandina temenê xwe di şidandina tecrîde de qayîm bike, dixe nava tirs û xofê.

Her wiha parêzerên Ocalan ji hêla hiqûqî ve her roj serî li dozgeriya komara tirk didin da ku rêyeke hevdîtîne ya Girava Îmaliyê bidin vekirin. Li gel hemû serlêdanên hiqûqî yên parêzeran jî, hevdîtin bi hincetan tên astengkirin. Serlêdana malbatan a ji bo hevdîtînê ya her hefteyê, bê bersiv tên hiştin...

**Hiqûqa navneteweyî ya Ewropayê!**

Hiqûqa 'navneteweyî ya Ewropayê,' mercên Îmraliyê yên tecrîda mutlaq bi 8'emîn rapora CPT'iyê ya hat destnîşankirin re, rexne kir û tecrîd li dijî hiqûqa navneteweyî hat dîtin. Lê wekî ku raya giştî jî vê rastiyê ji nêz ve dizane, ev rapor tenê di asta rexnekirine de ma, ji wê zêdetir tu gavên pratîk nehatin avêtin. Ya rastî mesele ji wê wêdetir e! Hêzên ku di şidandina tecrîda Îmraliyê de biryar dane; bi ragihandina rapora CPT'iyê ya ku temsîla hiqûqa Ewropayê ye xwestin ku têkoşîn û berxwedana dijî tecrîdê ya pêş dikeve bêdeng bikin. Loma li her qadê li dijî tecrîdê têkoşîn meşandin erkeke bingehîn a neteweya kurd e. Ji bo ku tecrîd bê parçekirin divê hemû rêyên têkoşînê mubah bin.

**Bidawîanîna peymanên antîkurd**

Dibe ku ev çalakiyên me li jor behsa wan kirin rutîn û ji rêzê bên dîtin, lê her ku helwesteke li dijî tecrîda Îmraliyê bi pêş dikeve eniya demokratîk a civakê fireh û geştir dibe. Tevahî cureyên çalakiyan ên li hember tecrîdê çendî xwedî hêza rêxistinkirî ya civakî bin, wê ew çend encam mezin be. Di esasê vê rastiyê de têkoşîneke piralî ji bo şikandina pergala tecrîdê; ji hêla hiqûqî, siyasî, civakî, dîplomasî û bîrdozî ve ku hev temam bike pêwîst e bê kirin. Ya tê xwestin, mezinkirina xeleka vê têkoşînê ye. Pêwîst e li dora berxwedana Îmraliyê, xeleka têkoşînê ya ji hemû reng û dengê civakî bê rêsandin heye. Dem êdî ne dema bilêvkirina kul û gazinan e, dem dema mezinkirina kar û xebatên têkoşîna azadiyê ye. Êdî kesek nikare vê heqîqetê ji nebîhîstî ve bê; gelê kurd, azadiya xwe di berxwedana Îmraliyê de dibîne. Peyva 'Azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan azadiya civaka gelê kurd e' divê hema wisa wekî gotinek ji rêzê neyê dîtin.

Lêgerînên der heqê şikandina tecrîdê de yên di asta cîhanê de pêş dikevin, divê ev helwest yek ji xelaka têkoşîna Îmraliyê bê dîtin. Bêguman parçekirina tecrîda li Îmraliyê, rûxandina polîtîkayên qirker ên şerê psîkolojîk e. Bidawîkirina plan, leyîstokên hêzên serdest ên ku sed sal beriya niha bingeha înkara neteweya gelê kurd erê kirine. Bidawîanîna peymanên antî kurd e. Bi girankirina pergala tecrîda li Îmraliyê re, statûkoperestiya herêmî yeqîn dike ku heyîna xwe mayînde bike. Ji ber vê pergala taybet a li Îmraliyê heye, îro berbelavî hemû civakê bûye. Ji holê rakirina siyaseta şerê taybet, bi vîna civaka azad pêk tê.

**Hêzên berpirsên tecrîda li Îmraliyê**

Rejîma ku berpirsê tecrîda li Îmraliyê ye, bi metodên şerê taybet wer difikire ku çareseriya pirsgirêka kurd, bi şidandina tecrîdê re wê ji rojeva siyasî ya Tirkiye û cîhanê bê tecrîdkirin. Lê wê ev hesap bi sernekeve. Pergala netewedewleta tirk, ji hêla mêjî ve rizîbûnê dijî. Ji rêya hiqûqa 'netewe dewletê' derketiye. Ji rê û resma qanûn, hiqûq û polîtîkayê dûr ketiye. Wekî termê mirarbûyî lê hatiye. Ji vê rejîma desthilat gorankarî/veguhertin hêvîkirin şaşîtî ye. Bi rûxandina tecrîda li Îmraliyê re, eniya siyaseta demokratîk dê pêş bikeve.

Berpirsê sepanên li Îmraliyê diqewimin, ew hêzên alîgirên alozî û neçareseriyê ne. Ev hêz bi tu awayî naxwazin ku pirsgireka kurd bê çareserkirin. Ev polîtîka dibe sedem ku tecrîd bê şidandin, qirkirina çandî û fîzîkî li ser gelê kurd bê kirin. Ew hêzên di şidandina tecrîda li Îmraliyê de bi israr in, heman ew hêz in ku di şerê li Kurdistanê diqewimê de xwedî rol in.

**Tecrîd ji planên qirkirinê ne qut e**

Divê bê zanîn ku pergala tecrîdê, ji planên qirkirinê ne qut e; tecrîd bi planên qirkirina ser gelê kurd re paralel tê meşandin. Tecrîd, erêkirina planên qirkirinê ya gelê kurd e. Valaderxistina planên qirkirinê, parçekirina tecrîda Îmraliyê ye. Rakirina vê zilmê, parçekirina 'konsepta çongdanînê' ye. Ji bo ku ev plan vala bên derxistin, hewceyî bi famkirin û derxistina zanebûna ruhê berxwedana Îmraliyê heye. Heyanî ku ew ruh neyê famkirin û bi vî ruhê têkoşîn neyê gurkirin, dê dîwarên tecrîda Îmraliyê neyên hilweşandin! Ji bo ku berxwedana Îmraliyê baş bê famkirin, lêhûrbûyîn, hîskirin, nîqaşkirin û fikirandineke kûr pêwîst e. Kengî dîwarê tecrîda li Îmraliyê hatin hilweşandin, wê hingê xweşî û kêyfxweşî bikeve navbera civakan de. Aramî û serfiraziya gelan dê bi rakirina diwarên pergala zilmê ya Îmraliyê serwext bibe.

Wê di encama vê têkoşîna bêrawest a gelê kurd de, dîwarê tecrîdê yê Îmraliyê bi hêz û rikek mezin a azadiyê bê şikandin. Dem ew dem e ku êdî dîwarên Îmraliyê bên hilweşandin...

# Efrîn bi bedewiya jinan hatibû xemilandin

Leyla Lorîn

Di çaryeka sedsala 21'ê de, jinên kurd di şexsê YPJ'ê de li rojavayê Kurdistanê û bakurê Sûriyeyê, li dijî çeteyên DAIŞ'ê yên hovber; şerekî bêeman kirin. Berxwedan û çelengiya jinên kurd a xwe rêxistinkirî, bû îlhama jinên dinyayê. Ev îlham herikî û bi pêlên xwe yê azadiyê, gelek jinên dinyayê hişyar kir û wan rapêça. Hîn jî bi vê hêz û rista xwe ya rêxistinkirî, îlhamê dide jinên cîhanê. Vê şerkeriya jinên kurd, rizgarkirina Kobanê û Efrînê jî mîsoger kir. Tê zanîn Efrîn yek ji wan bajarê kevnar û antîk ê kurdan e, piştî rizgarbûna xwe bû yek ji wan bajarê herî bedew ê azadiya jinan. Di vê bajarê gulistana bihara kurdewarî de, li ser hîmên Neteweya Demokratîk û li ser zanista jinên azad, pergaleke bi hunera jinan, bihuştek hat avakirin.

Bajarê Efrînê bajarê jinan bû. Di vî bajarî ku bi bedewiya jinan hatibû xemilandin de; di bin banê pergala xweseriya demokratîk de, bi rêveberî û avabûna saziyên gel û bi ked û tecrubeyên jinan pêşketinên dîrokî hat jiyîn. Çi ji asta zanebûna civakî, di xwerêxistinkirin û xwerêvebirinê de jî çandekeke demokratîk, dabûn avakirin. Ji mijara bîr û baweriyê heta di têgihiştina dîrok, wêje û ziman de jî pêşketinên berbiçav û şoreşeke çandî pêş ketibû. Di heman demê de jî di xweparastinê de jî hêza xwebûna xwe, xwe xistibû îlhama hemû jinan. Bi kurtî di her sazî û dezgaya Pergala Netewaya Demokratîk de, jin bi reng û dengê xwe û bi hêza xwe ya cewherî û rêxistinkirî li vê bajarê ku bi bihuşta zeytûnan dihat nasîn, pêşeng bûn.

**Li ser Efrînê planên reş û tarî**

Di bajarê jinan de, bêtehemul û nemerdaneya dewletên zirhêz, bi bêbextiya dewletoka Rûsya bi faşîzma qirker a dewleta tirk, bi hevkariya xiyaneta ENKS'ê, li hemberî pergala jinên xwerêxistinkirî, ketin nava planên reş û tarî. Û bi desteka dewletên hegemon, dewleta tirk di 18'ê Adara 2019'an de bi 72 balafirên şer, Efrînê dagir kirin. Piştî dagirkirina Efrînê heta niha; li ser erdnîgariya bajarê jinan, talan û wêran û kambaxî, revandin û tecawiz, zindankirin, li ser raman û bedena jinan xilas nebûye. Girêdayî siyaseta dewleta tirk, 'ENKS' ku bi hevkariya wan roj serde derbas nabe, ew qas sivîl û jin tên revandin; sûc û kiryar bi destê hevkariya wan sînoran nas nake; bi ser de jî bang dikin, Efrîn aram e. Gelo ev ne bêesîl û xayîntî be, ma yê çibe? Li çiyayê Kurdistanê, dewleta tirk, bi hevkariya PDK'ê li dijî jinên şoreşger û gerîlayên azadiyê, şereke qirêj û serkêşiyê dike û gerîla şehîd dixin. Û li Efrîna dagirkirî jî çeteyên dewleta tirk, bi hevkariya ENKS'ê li dijî beden û axa jinan, sûc û kiryaran mezin dike. Lewma li dijî jinên xwerêxistinkirî, zihniyeta PDK'ê çibe, ya ENKS'ê jî bi heman awayî ye.




**Awir û sekna jinan**

Bersiv û sekna li hemberî van êrîşan bêesil û xayînan, gelek zelal e. Di çav û hêrsa jinên kurd de, li dijî van polîtîkayên qirkirina li ser raman û bedenên jinên kurd tên pêkanîn, hesapxwestin jî pir mezin e. Jinên şoreşger li çiyayên azad, li dijî faşîzma qirker, zilamê kujer, qatil û tecawizkar, her roj bi çalakiyên xwe yên efsûnî û berxwedanê li dijî faşîzmê dimeşînin. Û bi giyanên xwe tola hemû jinan distînin. Li Şehbaya berxwedêr jî her kêlî ji bo jinan rista berxwedanê ango xwerêxistinkirinê ye. Jinên koçber di hemû perwerde û civînên xwe de bi lêv dikin, heta ku komên girêdayî Tirkiyeyê li Efrînê hebin, dê venegerin. Heta ku jinek rêxistinkirî hebe dê çûyîn çênebe. Efrîna niha ji bo jinên xwerêxistinkirî dojeh e. Dîsa di awir û sekna jinan de tê dîtin ku tola vegera Efrînê bi têkoşîn û xwerêxistinkirina jinan bê dayîn.

## Balafiran gund bombe kirin

Di salên dawî de balafirên şer ên Tirkiyeyê li başûrê Kurdistanê gelek war û gund bombe kirin. Li Mexmûr, Şengal, Duhok, Hewlêr, Silêmanî û gelek navendên din gelek caran gund hatin bomekirin û gelek welatiyan jiyana xwe ji dest dan. Balafirên şer herî dawî gundê Sînemokê bombe kir. Balafirên şer ên Tirkiyeyê di 7'ê îlonê de gundê Sînemok ê nehiyeya Sengeser a navçeya Qeladizê 3 caran bombebaran kir. Balafiran yekser welatiyên sivîl kir hedef û di encamê de 3 welatî birîndar bûn. Hevşaredarê Binarê Qendîlê Mihemed Hesen der barê êrîşê de ji Rojnewsê re axivî û got; "Di şeva 7'ê îlonê de balafirên şer 3 caran gundê Sînemok bombebaran kirin. Ji ber êrîşê 3 welatî birîndar bûn û 4 xanî xera bûn." ***AMED***

## Şopa nivîsên nijadperestiyê

Li ser derenceyên dibistana li taxa Onûr a navçeya Seyhan a Edeneyê ku piranî kurd lê dijîn rayedarên dibistanê nivîsa 'Ya tirkî biaxive yan jî bêdeng be' nivîsandin. Li ser derenceya Dibistana Navîn a Sala 125'emîn nivîsa ku ji bilî tirkî zimanekî din neyê axaftin nivîsîn. Li ser pêpêlûkên derenceyê nivîsa 'Ya tirkî biaxive ya jî bêdeng be' hat nivîsandin. ***EDENE***

## Civîna perwerdeyê ya li Mexmûrê

Li Wargeha Penaberan a Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr) bi tevlîbûna 140 delegeyan 12'emîn Konferansa Saziya Perwerde û Hîndekariyê ya Wargeha Mexmûrê pêk hat. Di 12'emîn Konferansa Perwerde û Hînkarî ya Wargeha Penaberan a Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr) de, mamosteyan di der barê kar û xebatên du salan de nirxandin kirin. Konferans bi xwendina pêşnûma biryarên saziya qada perwerde û hînkariyê, bi wê ve girêdayî hilbijartinên desteya disîplînê û hevserokan bi dawî bû.Hevserokê Rêveberiya Qada Perwerdehiyê Xelîl Bîlen axaftina girtinê kir û wiha got: "Bi hemû xweşî û nexweşiyê em bi hev re bûn û em wek malbatekê lê hatine. Eger perwerdekar karê xwe neke civak bi rê ve naçe." Piştî axaftina girtinê konferans bi diruşmeyên 'Bijî Serok Apo', 'Bê Serok Jiyan Nabe' bi dawî bû. ***MEXMÛR***

## Li şûna vemirînin temaşe dikin

Daristana li gundê Pîrêjmanê yê Pîrana Amedê hefteyek e dişewite. Welatiyan anîn ziman ku hefteyek berê agir bi daristanê ket û agir nêzî gund bûye. Welatiyan têkildarî şewata daristanê agahî dan û anîn ziman ku di 7'ê îlonê de li qada daristanê teqîneke mezin çêbû û piştre balafirên şer hatin qad bombe kirin. Welatiyan dan zanîn ku roja ewil xwestin biçin agirê bi daristanê ketiye vemirînin, lê panzêrê hat rê girt û destûr neda welatî mudaxaleyî şewatê bikin û wiha gotin: "Piştî agir bi daristanê ket, gelek cih û dever tev şewitîn. Du roj berê du helîkopter hatin li qadê gule reşandin û çûn. Niha li qadê daristan hêj dişewite. Yekîneyên agirkujê hatin qadê. Lê tenê li wir rawestiyan. Leşker bi panzêran li navbera gund û qada şewatê rawestiyan. Destûr nedan ku welatî mudaxaleyî agirê daristanê bikin." ***AMED***

# 190 roj in li edaletê digere

### Dayika Emîne Şenyaşar ji bo edalet pêk bê li dijî hemû zextan 190 roj in bi biryar li ber xwe dide. Her diçe piştgirî zêde dibe

Navenda Nûçeyan




Emîne Şenyaşar a ku xizmên Parlamenterê AKP'ê yê Rihayê Îbrahîm Halîl Yildiz hevjîn û du lawên wê kuştin, 190 roj in bê navber li edaletê digere. Rayedarên darazê li şûna kujeran derxin pêşberî dadger, doz li Emîne Şenyaşar vekirin. Emîne Şenyaşar dê bi îdiaya 'heqaret li wezîfedarê cemaweriyê kiriye' dê di 12'ê mijdarê de derkeve pêşberî dadger.

Emîne Şenyaşar ji 9'ê adarê ve ji bo 'Edalet' pêk bê û kujerên hevjîn û du lawên wê yên hatin kuştin bên darizandin, dîsa ji bo lawê wê yê girtî Fadil Şenyaşar were berdan bi biryar nobeta edaletê digire. Malbata Şenyaşar 190 roj in daxwaz dike ku bi Serdozgerê Komarê û dozgerê dosyayê re hevdîtinê bike. Lê ev daxwaz tê redkirin. Emîne Şenyaşar a ku bi dehan car ketina wê ya avahiya edliyeyê hatiye astengkirin, wê di roja 12'ê mijdarê de ne ji bo hevdîtinê ji bo îfade bide bikeve avahiya edliyeyê.

Şenyaşar dê li Dadgeha Cezayê ya Asliye ya 2'yemîn bê darizandin. Lê 3 sal û 3 meh borîn, hêj der barê kujerên hevjîn û 2 kurên wê de doz nehatiye vekirin. Dozger ji Emîne Şenyaşar re heta 4 salan cezayê girtîgehê dixwaze. 200 parêzer xwe amade dikin ku di roja 200'emîn a çalakiyê de piştgiriyê bidin Emîne Şenyaşar.

Di 9'ê îlonê de, bi angaşta ku di roja 86'emîn a nobetê de 'heqaret' li Parlamenterê AKP'ê Îbrahîm Halîl Yildiz kiriye li 2'emîn Dadgeha Cezaya Giran a Rihayê doz li Emîne Şenyaşar hatiye vekirin. Di 10'ê îlonê de jî bi angaşta ku di heman rojê de 'heqaret' li Wezîrê Karên Hundir Suleyman Soylû jî kiriye Emîne Şenyaşar îfade da. Parêzerê dosyayê Gokhan Dayik jî bi Emîne Şenyaşar çû midûriyeta polîsan. Emîne Şenyaşar, di îfadeya xwe de da zanîn ku heqaret li Soylû nekiriye. Piştî îfadeyê careke din vegeriya qada nobetê. Parêzer Gokhan Dayik jî diyar kir ku armanca doza ku li Emîne Şenyaşar hatiye vekirin û vexwendina wê ya îfadeyê tepisandina malbatê ye û wiha got: "Muwekîla min 'heqaret' li Soylû nekiriye. Beriya çend rojan bi angaşta ku 'heqaret' li Parlamenterê AKP'ê Îbrahîm Halîl Yildiz jî kiriye doz lê hatibû vekirin. Piştre vexwendin îfadeyê. Binçavkirin û vekirina dozan ji bo tepisandina malbatê ye. Em ê li cem malbatê bin û doza wan bişopînin. Divê herkese xwedî wijdan di vê pêvajoyê de malbatê tenê nehêlin. Divê bibin dengê wan. Mîna her kesê daxwaza malbatê jî edalet e."

**Piştgiriya ji bo Şenyaşar didome**

Endamên Înîsiyatîfa Dayikên Aştiyê ya Şirnexê, aktîvîstên Tevgera Jinên Azad (TJA) û rêxistinên Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) ên navend û navçeyên Şirnexê di roja 184'an de serdana Malbata Şenyaşar kirin. Malbatê şande bi dowîzên 'Bila edalet were, zilm bi dawî bibe' û 'Em edaletê dixwazin' pêşwazî kirin. Jinan serpêhatiyên Emîne Şenyaşar a hevjîn û du kurên wê hatin qetilkirin guhdar kirin.

Piştî ku çalakiya Malbata Şenyaşar li Tirkiyeyê deng veda ji gelek bajarên Tirkiyeyê partiyên siyasî, rêxistinên sivîl, rêxistinên pîşeyî û parazvanên mafên mirovan hatin ber Edliyeya Rihayê û piştevaniya Malbata Şenyaşar kirin.

# Kujer hê jî serbest in

Navenda Nûçeyan

Maşîneyên zirxî yên polîsan li bajarê Kurdistanê ji 2008'an heta niha 26 jê zarok 50 welatî qetil kirin. Dîsa 52 welatî jî di bûyerên maşîneyên zirxî yên polîs û leşkeran de birîndar bûn. Di 13 salên dawî de maşîneyên zirxî yên polîs û leşkeran li kolanan zarok, kal û pîr qetil kirin. Lê heta niha tu polîs û leşkerên bûne sedema kuştinê nehatine cezakirin. Herî zêde li Şirnex û navçeyên wê mirov hatin kuştin. Ji sala 2008'an ve ji ber ku maşîneyên zirxî li wan qelibîne 10 kesan li Şirnexê jiyana xwe ji dest dan û 13 kes jî birîndar bûn. Herî dawî di 3'ê îlonê de, li taxa Tûrgût Ozal a navçeya Hezexê ya Şirnexê polîsan bi maşîneya zirxî li Mîraç Mîroglû yê 7 salî qeliband û kuşt. Serokê Baroya Şirnexê Rojhat Dîlsîz diyar kir ku di demên dawî de bûyerên ku maşîneyên zirxî dibin sedema mirinan zêde dibin û wiha got: "Di hevdîtinên me yên bi rayedaran re rayedar hebûna maşîneyên zirxî bi 'ewlehiyê' ve girê didin. Hebûna maşîneyên zirxî ya li qadên lîstikên zarokan ji bo herêma me pirsgirêkeke mezin e. Di dosyayên ku failên wan polîs û leşker bin bi duristî nayên birêvebirin û di pêvajoya darizandinê de cezayê heq nayê dayîn. Ev jî dibe sedema hin bûyerên din. Me bi dozgerê doza Mîroglû re hevdîtin kir. Dozger dibêje, 'qeza ye û bersûc encameke wiha nexwestiye'. Ev ne qezayek û mirineke jirêzê ye. Faîl kî dibe bila bibe divê cezayên ku di qanûnan de hatiye diyarkirin bikişîne."



# Dikujin û paşê berdidin

Navenda Nûçeyan

Girtîgehên Tirkiyeyê ji bo girtiyên nexweş bûye goristan. Ji ber girtiyên nexweş nayên dermankirin û serbest nayên berdan her roj cenazeyên wan ji girtîgehê derdikevin. Herî dawî Mehmet Alî Çelebî yê 70 salî piştî hat berdan hefteyek şûnde mir. Li Tirkiyeyê 355 girtîgeh hene û li van girtîgehan 282 hezar û 703 girtî hene. Li gorî dane û rapora ÎHD'ê jî 604 jê giran bi giştî Hezar û 605 girtiyên nexweş hene. Ji van girtiyên nexweş jê 249 girtiyên jin in. Lê gelek girtiyên nexweş ên serî li ÎHD'ê nedane jî hene. Li gorî vê yekê hejmara girtiyên nexweş zêdetir e.

Girtiyên nexweş an bi kelepçe derman dikin an jî derman nakin. Niha jî bi hinceta vîrûsê an dixin karantînayê an jî derman nakin. Girtiyên nexweş ji ber van şertan nikarin sûdê ji nexweşxaneyê bigirin. Li gorî peymanên navneteweyî divê girtiyên nexweş bên berdan li gorî û rêgez û rêbazên Mandela, Rêgezên Sincî û Tibbî, Rêgezên Girtîgehan ên Komîteya Ewropa yên Konseya Ewropa (2006) li gorî pêşniyaza xala 2'an divê girtiyên nexweş ji mafê tenduristiyê sûdê bigirin û bên dermankirin. Li gorî belgeya Danezana Lîzbon a Yekîneya Tabîban a Cîhanê ku di sala 1981'ê de, nexweş azad e ku bijîşkê xwe li gorî xwe hilbijêre.

Lê li gel mafê girtiyan ên dermankirin û berdanê heye jî nikarin ji mafê xwe yê zagonî sûdê bigirin. Girtiyên nexweş ji ber ku nikarin sûdê ji mafê zagonî bigirin li girtîgehê dimirin. Herî dawî di 4'ê îlona 2021'ê de girtiyê nexweş Mehmet Alî Çelebî yê 70 salî ku di 25'ê tebaxê de ji ber nexweşiya giran ji Girtîgeha Sîncan a Enqereyê hatibû berdan, mir.

# Konferansa li dijî dagirkeriyê

Navenda Nûçeyan

Platforma Dijî Dagirkeriyê encamnameya Konferansa Neteweyî ya Dijî Dagirkeriyê ku 4'ê îlona 2021'ê li Hollandayê bi beşdariya nûnerên gelek partî û rêxistinan pêk hatibû, aşkera kir. Ev biryar hatin girtin:

*Li hemberî dagirkeriyê ji bo serkeftineke misoger pêk were, pêwîstî bi yekrêziya hêzên Kurdistanê heye. Divê hemû hêzên kurdistanî bi yekdengî li dijî dagirkeriyê rawestin, bê helwest nemînin û bi tu awayî nebin şirîkê êrîşan.

*Em bang li hemû partî, sazî û rêxistinên kurdistanî dikin da ku ji bo xurtkirina yekrêziyê û pêşî lêgirtina xetereyan lijneyeke bilind a di asta mektebên siyasî de amade bikin û dest bi kar bikin.

*Berpirsiyariyeke mezin jî li ser milê rewşenbîr û kesayetiyên Kurdistanê ye. Ev aliyên kurdistanî, divê bi helwesteke tund li dijî dagirkeriyê rawestin û bibi bandor hişyarî bidin hêzên kurdistanî.

*Dewleta tirk hêza xwe ji bêdengiya hêz û saziyên navneteweyî digire. Ji ber vê bêdengiyê, çekên kîmyewî jî tê de hemû cûre çekan bi awayekî bêperwa bi kar tîne. Li hemberî van kiryarên qirêj bêdengî, şirîkatiya sûcên şer û mirovahiyê ye. Em bang li hemû hêz û saziyên navneteweyî dikin ku li hemberî sûcên dewleta tirk bêdeng nemînin û piştgiriya gelên Kurdistanê bikin.

*Ji bo Platform bikaribe xebatên xwe bi bandortir bike, pêwîstî bi berfirehkirina platformê heye. Bi vê armancê ve girêdayî di konferansa me de komîteya peywendiyên li gel partî, rêxistinên siyasî, rewşenbîr û kesayetiyên kurdistanî; komîteya ragihandinê û hewldana pozîtîfkirina zimanê ragihandina kurdistanî û komîteya lobî û dîplomasiyê ya ku pêywendiyên li gel partiyên siyasî û parlementoyên dewletên Ewropayê pêk bîne, hatine damezirandin.

## DIVÊ GELÊ KURD BIRYARÊN RADÎKAL BIGIRE

# Li 113 welatên NY'yê pir zimanî heye

Medya Bal

*Me vê heftê hevpeyvîna xwe bi Hevserokê Komeleya Lêkolînê ya Ziman û Çandên Mezopotamyayê (MED-DER) Rifat Ronî re kir. Ronî di hevpeyvînê de behsa xebat û polîtîkayên li dijî ziman û perwerdeya kurdî kir. Ronî da zanîn ku tevî hemû astengiyên li pêşiya ziman û perwerdeyê ew her di kar û xebatên xizmeta ziman de berdewam in. Ronî bal kişand ser girîngiya perwerdeya bi zimanê dayikê û got ku zarokên bi zimanê xwe perwerde dibin her dem ne tenê gavekê ew 3 gavan li pêş in. Fermo em bi hev re li pirs û bersivên di vê der barê de binêrin.*

**Ji roja ku Komara Tirkiyeyê hatiye avakirin heya niha zimanê kurdî qet nekiriye zimanê perwerdeyê. Bi we sedema sereke ya vê kiryarê çi ye?**

Gelê me û civaka me tev dizane, bi taybetî kesên serê xwe pê re diêşînin pir baş dizanin ku ev 98 sal in in Komara Tirkiyeyê ava bûye. Komar taybetî ji bo înkar û tunekirina gelê kurd hatiye avakirin. Çima? Ji ber ku li vî welatî alternatîfa jiyana azad û alternatîfa demokrasiyê gelê kurd e. Pergala Tirkiyeyê û hikûmetên ji destpêkê heta niha hatine ser kar, her tim ji ronahiyê ditirsin û her tim dixwazin tarîtî serwer be. Ji bo tu kes karê wan ê qirêj nebîne. Dewleta tirk û hikûmeta Tirkiyeyê dibêje 'Dema zarokên kurd bi zimanê xwe perwerde bibin, di aliyê zanîn û zanistê de dê pêş bikevin. Wê gavê polîtîkayên me yên înkar û asîmîlasyonê ku em li ser gelê kurd ferz dikin, dê baş bên dîtin û baş bên teşhîrkirin.' Ji ber vê yekê hikûmet û dewlet naxwazin kurd bi zimanê xwe perwerde bibin. Mesele înkar û tunehesibandin e. Li ser hemû avahî, li ser hemû çiya û newalên vî welatî diruşmeyên nijadperest hatine nivîsîn. Gelê kurd ji destpêka dîrokê heta îro li ser vê axê dijî. Dibêjin 'Ev welat welatê tirkan e. Em bi tu awayî destûr nadin bê parçekirin'. Lê yên vî welatî parçe dikin ew kes in ku li ser gelan yek zimaniyê, yek alatiyê, yek çandiyê û yek neteweyiyê ferz dikin. Ji tirsa ku bêrêzî û bêhurmetiya li dijî gelan hatiye kirin deşîfre nebe, perwerdeya zimanê dayikê naxwazin.

**Di sala 1990'î de Neteweyên Yekbûyî ji bo zarok bi zimanê zikmakî perwerde bibin peymanekê amade kir û ev ji aliyê Tirkiyeyê ve jî hat îmzekirin. Lê Tirkiye bi fikar nêzikê madeyên 18, 29 û 30'î bû. Hûn vê nêzikatiyê çawa dinirxînin?**

Gava di sala 1989'an de ev peyman hat sazkirin û ji aliyê endamên Neteweyên Yekbûyî (NY) ve hat qebûlkirin, hemû maf û azadiya zarokan, jiyan û derûniya zarokan bi her awayî li ber çavan hatiye girtin û ev xal hatine danîn. Endamên Neteweyên Yekbûyî jî li gorî vê yekê ev xal îmze kirine. Tirkiyeyê jî di sala 1995'an de ev peyman qebûl kiriye. Lê 3 xalên girîng ên ji bo hemû zarokên cîhanê jiyanî û jêneger in, ji bo van 3 xalan fikarên wan hene. Çima? Yek jiyana zarokan a bi civak û kevneşopiya xwe re, dudu çanda zarokan a bi dapîr û bapîrê xwe re û sisê mafê perwerdeya bi zimanê dayikê. Ev her sê xal ji bo jiyana zarokan tiştên jêneger in. Ji ber vê yekê fikarên Tirkiyeyê li ser van xalan hene. Çima bi taybetî fikar li ser van xalan in? Di vir de bi rastî armanc û meqsedên xêrnexwazî, tunehesibandinê hene. Divê binê wê bê xêzkirin. Armanca astengiya perwerdeya zarokên kurd, tarîhiştina siberoja gelê kurd e.

**Bi salan e ku gelê kurd bi zimanê xwe perwerde dixwaze. Heke ev pêk were dê di jiyan û siberoja kurdan de çi biguhere?**

Li vî welatî bi milyonan zarokên kurd, bi dehan nifş ji vî mafê perwerdeya zimanê dayikê bêpar in. Her wiha zarokên kurd, heta 6-7 saliya xwe heta perwerdeya zimanê serdest a dewletê, di heqîqet û xwezaya xwe de dijîn. Bi zimanê dayika xwe dijîn. Ji zimanê dayika xwe sûdê digirin. Lê piştî perwerdeya dewletê dest pê dike, wekî masiyê tu ji avê derxî, ew zarok êdî ji dinyayekê dikeve dinyayeke din. Wê gavê zarok wekî şoqekê dijîn.

Em tim dibêjin zarokên bi zimanê dayika xwe dest bi perwerdeyê nekin û li wî welatî jî zimanê serdest li wan bê ferzkirin, ew pêş nakevin. Zarokên di mufredata dewletê ya fermî de bi zimanê tirkî perwerdeyê dibînin, zarokên ku zimanê perwerdeyê ne li gorî zimanê wan be, tim û tim sê gavan li paş dimînin. Heke ev astengî û polîtîkayên bişaftinê ji holê rabin, wê civaka kurd jî bibe civakeke ronak. Wê bibe civakeke pêşbîn.

**Bi dehan saziyên ziman hatin girtin û îlegalîzekirin. Sedema girtina van sazî û komeleya çi ye û heke ev komele nehatana girtin dê karibûna ji bo perwerdeya zimanê zikmakî alternatîfekê ava bikirana?**

Em li Amedê dijîn. Amed wekî bajarekî kurdan û kurdewar tê dîtin. Eger em peywirdar û karmendên dewletê jê derxin, şêniyên Amedê ji sedî 95 kurd in. Em binêrin di pergala perwerdeyê de zarokên kurd, gelê kurd, çiqas sûdê ji pergala perwerdeya zimanê zikmakî digirin. Mînak li vî bajarî, ji pêşdibistanê heta zanîngehê, ji 2 hezarî zêdetir dibistanên ku bi tirkî perwerdeyê didin hene.

Lê ev bajarê ku nifûsa wî ji sedî 95 kurd in, yek dibistan jî ji bo vî gelî û vê civaka kurd nehatiye avakirin. Lê gelê kurd bi derfetên xwe yên pir zor û zehmet ji bo zarokên wan bê perwerde nemînin û ji bo bi zimanê dayika xwe perwerde bibin, dibistan ava kirin. Lê ev dibistan jî ji aliyê dewletê ve hatin girtin û mohrkirin. Hemû alav û amûrên wan jî hatin desteserkirin. Ger ku li vî bajarî 2 hezar dibistanên tirkî hebin û yek dibistana kurdî tune be, ev rastiyê li ber çavan radixe. Ev sosret e. Divê hemû dinya vê rastiyê û vê binpêkirina mafê azadiyê bibîne. Em qala gelê kurd yê bi deh milyonan dikin.

98 sal in Komara Tirkiyeyê hatiye avakirin. Komara tirk wekî zarokekî tim diziyê dike û êdî civak tu nirx û rûmetê nadinê. Êdî dinya bi vî çavî li Komara Tirkiyeyê dinêre. Em li gelek welatan dibînin, ewil zimanên civakan hatin înkarkirin. Piştre ev di zagonên xwe de rast kirin û êdî vê pirsgirêkê najîn. Di 194 welatên ku girêdayî NY'ê ne, li 113 welatan pirzimanî heye.

**Wekî hûn jî dizanin serdema dibistanê di 6'ê îlonê de dest pê kir. Hûn wek saziya MED-DER'ê ji bo malbatên neçar dimînin û zarokên xwe didin ber perwerdeya zimanê tirkî çi pêşniyaz dikin?**

Civaka kurd ji çar aliyan ve hatiye dorpêçkirin. Welat di nava 4 dewletan de hatiye parçekirin. Tim û tim polîtîkayên bişaftin, birçîhiştinê û înkarê li ser vî gelî tê ferzkirin. Lê ziman nebe nabe. Gava ziman jî tune bibe êdî civak jî tune dibe. Ji ber ku ziman stûna bingehîn a netewebûnê ye. Gava ziman nebe, mirov nikare qala netewebûnê jî bike. Em wekî civaka kurd û siyasetmedarên kurd divê ji bo siberojê ji niha û pê de, divê em ji polîtîkayên borî dersinan derxin. Divê em ji bo siberojê plansaziyekê bikin ku em karibin ji vê rewşê rizgar bibin. Divê siyasetmedarên kurd rûnên û serê xwe bi vê meseleyê re biêşînin û vê şermê ji ser xwe hilînin.

**Komeleyên kurdî çima tên girtin?**

Di 2004'an de piştî hezar hincetên astengiyan kursên kurdî hatin vekirin. Li Edene, Amed, Êlih û çend bajarên din kursên ziman vebûn. Dewletê hem kurs vekir, hem jî li hemberî welatên Ewropayê got 'Va ye ez demokrasiyê tînim û reforman çêdikim'. Dewletê bi xwe ev kurs vekir, lê piştre bi xwe ev kurs asteng kirin.

Bi rastî piştî kurs hatin girtin, wekî alternatîfekê, Kurdî-Der hat vekirin, Enstîtuya Kurdî ya Ehmedê Xanî hat vekirin. Di 2006'an de Kurdî-Der hat vekirin û heta 2015'an herikînek çêbû. Gel jî êdî kursên ku ji aliyê Kurdî-Derê ve dihat dayîn wekî alternatîfa perwerdeyê didît. Dewletê jî êdî ev yek ferq kir û xwest pêşî lê bigire. Kurdî-Der ji bo xwe wekî xetere dît. Nabêje li vî bajarî 2 hezar dibistanên bi tirkî perwerde didin hene lê yek dibistana wan a bi zimanê kurdî perwerde bide tune ye. Kurdî-Derê bi hezaran mamoste gîhandin. Bi deh hezaran şagirt hatin li vir zimanê xwe fêr bûn. Li vir materyal hatin avakirin. Vê yekê bala dewletê kişand. Ji bo dibistanan pirtûk hatin çapkirin. Gel hêviya xwe ji dewletê birî û berê xwe da dibistanên sembolîk ên azad. Yek li Amedê Dibistana Ferzat Kemanger, yek li Cizîrê Dibistana Berîvan, yek jî li Geverê Dibistana Dayika Uyevş hatin avakirin. Kurdan dixwest zarokên xwe bişînin vir. Van dibistanan bi qasî 370 şagirtî girtin, lê fîzîka dibistanan têra şagirtan nekir. Lê dewletê ji vê yekê re jî tehamul nekir û derî mohr kirin. Lê kurdan mohr şikand. Piştî 10-15 sal berê dibistanên niha tên vekirin wekî ji nû ve bên vekirin. Ji xwe karê wan jî ew e ku bê hafiza bihêlin. Her tim dixwazin kurd ji sifirê ve dest bi kar bikin. Arşîv û hafize hat tunekirin. Ji ber vê yekê îro em ji nû ve dest bi karên 10 sal berê dikin.

Heta gelê kurd biryara xwe nede ev rewş dê bidome. Divê hin bedelan bide. Yan dê salek du salan zarokên xwe ji dibistanên tirkî paşve bikişîne heta ku dewlet mafê wan qebûl bike. Yan jî dê ev pergal bidome.

Mînak li Cezayirê gelê Amazîx heye. Di sala 1995'an de kampanya bi navê 'Tûrikê Dibistanê' dan destpêkirin. Salekê ji pêşdibistanê heta zanîngehê tu zarokên xwe neşandin dibistanê. Sala din hikûmeta Cezayîrê mecbûr ma di zagonan de cih bide perwerdeya zimanê zikmakî. Piştî ve yekê hemû zarok bi zimanê zikmakî perwerde dibin. Gelê kurd jî divê biryarên wiha radîkal bigire. Ev ji bo siberoja gelê kurd pêwîst e. Siyasetmedarên kurd divê di xala perwerdeya zimanê dayikê de israr bikin. Ez hêvî dikim em ê di demek nêzîk de bi vê hişmendiyê kar û xebatên xwe bikin.


**Xebatên MED-DER'ê niha di çi astê de ne?**

MED-DER wekî hemû saziyên kurdî ji bo hişmendî û hişyariya kurdî di nava civakê de pêş bixe hatiye avakirin. Kar û xebatên xwe bi piranî di aliyê hişyarî û hişmendiya ziman de dimeşîne. Komeleyek nikare ji bo pêdiviyê bi deh milyonan zarokên kurd re bibe bersiv. Nikare li gorî vê pêdiviyê perwerde bide. Ev rastiyek e. Lê MED-DER dikare polîtîkayên dewletê yên heta niha li dijî perwerdeya zimanê zikmakî hatiye pêşandan di qada neteweyî û navdewletî de teşhîr û îfşa bike. Niha ji bo bala gel bikişîne bi dehan polên me hene. Ji ber pandemiyê nêzî salek e me navber dabû xebatên xwe yên rû bi rû. Ji niha û şûnde em ê van polên xwe yên rû bi rû bidin domandin. Niha 7 polên kurmancî û 3 polên kirmanckî dê rû bi rû dest pê bikin.




Ger ku li bajarekî wekî Amedê ku ji sedî zêdeyî 95 şêniyên wî kurd in 2 hezar dibistanên tirkî hebin û yek dibistana kurdî tune be. Ev sosret e. Divê hemû dinya vê rastiyê û vê binpêkirina mafê azadiyê bibîne. Divê êdî gelê kurd biryarên radîkal bigire

## Rifat Ronî kî ye?



Di sala 1965'an de li gundê Heşoliyê yê Amedê ji dayik bûye. Dibistana seretayî li gund xwendiye. Dibistana amadeyî li Amedê û zanîngeh jî li Zanîngeha Dîcle ya Amedê xwendiye. Di destpêka Kurdî-Derê de tev li kar û xebatên ziman bûye. Piştî 2014'an, di partiyên siyasî de xebat kiriye. Niha jî Hevserokê saziya ziman ya MED-DER'ê ye. Berê paşnavê wî Ozturk bû. Di pêvajoya çareseriyê de serî li dadgehê daye û paşnavê xwe kiriye Ronî.



KitêbXaneya CAB
Yaqob Tilermenî

# Hemçaxê Ehmedê Xanî nivîskar Jean De La Fontaine

Château-Thierry, bajarokekî biçûk ê bi ser bajarê Aisne yê li herêma Hauts-de-France ya welatê Fransayê ye. Li vî bajarokî helbestvan û nivîskarekî bi navê Jean de la Fontaine di sala 1621'ê de hatiye dinê ku li dû 400 saliya çêbûna xwe hê jî berhemên wî bandorê li mirovên cîhanê dike. Di heman sedsalê de li gundê Xanê yê bi ser bajarê Hekariya Kurdistana di bin nîrê Osmaniyan de helbestvanekî kurd di sala 1950/51'ê de hatiye dinê ku wî jî bi *Memûzîna* xwe bandoreke sedsalan e li mirovên kurd kiriye. La Fontaine mirovekî xwedî nasnameyeke neteweyî ya fransî bû ku neteweya wî ji aliyê hemû cîhanê ve dihat qebûlkirin; Xanî bi nasnameya xwe ya kurdî di binê hikmê Osmaniyan de weke hemû hemnijadên xwe dijiya û nasnameya wî ya neteweyî ji aliyê hemû cîhanê ve nedihat pejirandin ku hê jî nayê pejirandin.

Pejirandin û nepejirandina nasnameyên neteweyî ji aliyê hemû cîhanê ve hêmaneke girîng e ku ev hêman di heman demê de nasandin, navdarbûn, wergerandin û navneteweyîbûna ziman û berhemên nivîskarekê/î jî diyar dike. Dema neteweyek bi giştî bindestê çend serdestan be û ew serdest jî bi tunebûna cihêrengiyên te mijûl be, tu yê jî nikaribî weke parçeyeke çanda cihanî werî naskirin û pejirandin. Digel ku Memûzîna Xanî berhemeke manzûm a resen e ji bo wêjeya cîhanê, ji ber sedemên li jorê diyarkirî di herêmeke teng de maye û nebûye berhemeke milkê wêjeya cîhanî. Her wiha kitêba wî ya ji bo zarokan *Nûbara Biçûkan* bi xwe li gorî serdema sedsala 17'emîn berhemeke qedirbilind û girîng e ku ew hê jî bi temamî nebûye mal û milkê wêjeya kurdî, ji lewre negihîştiye zarokên kurdan.

Helbet berawirdkirina du nivîskarên giranbuha La Fontaine û Xanî, di nivîseke rojnameyê de derfetê nabîne ku li ser hemû hêlên nivîskarên wan û berhemên wan were rawestin. Lê xwende û zanayên kurd ên ciwan dikarin bi tezên (lêkolînên) akademîkî vî karî ji her kesî çêtir bikin û ragihînin hemû derên cîhanê. Ji ber hindê ez ê vê meseleyê bihêlim ji wan re û werim ser meseleya xwe ya bingehîn: Jean de la Fontaine.

***

Jean de La Fontaine di sala 1621'ê de hatiye dinê ku di ser çêbûna wî re 400 sal derbas bûne. Her wiha ev hejmara gilover, 400 ji bo xwînerên fablên wî weke sembolekê şayanî girîngiyê tê dîtin û ji bo zindîhiştina bandora wî li gelek hêlên cîhanê tê pîrozkirin. Bajarokê Vevey ê bi ser bajarê Lozana Swîsreyê jî bi hin hewldanên xwe vê girîngiyê pêşwazî dike. Li çend cihên diyarkirî, di nava fetlonekên rêyan de wêneyê wî yê weke peykerên metalî, weke pano, weke nivîs hatine danîn û mirov ji bo tevlêkirina ahengan hatine vexwendin. Ji lewre li şatoyeke devê gola Lémanê di nava Muzeya Pêlîstokan de La Fontaine tê danasîn û fablên wî têne xwendin. Li vê herêmê yek ji pûtepêdana vî nivîskarî ew e ku berhemên wî bi zimanê Fransî ne û Kantona Lozanê jî fransîaxêv e. Helbet li kantonên din jî çalakiyên weke şev û şahiyên şanoyan jî têne lidarxistin.

Her çiqas La Fontaine weke nivîskarên fabl û xeberoşkan tê naskirin jî, ew helbestkarekî serdema xwe ye jî. Ew di çerxa perwerdeya dînî re derbas bûye û pişta xwe daye dînê û herî dawî li Parlamentoya Parîsê bûye parêzerek. Li Parîsê komeke helbestvan a bi navê Şovalyeyên Maseya Gilover nas kiriye û xebatên xwe yên wêjeyî geştir kiriye. Dû re li bajarokê Chateau-Thierryê weke berpirsiyarê av û daristanan xebitiye. Dema di karê xwe de weke mirovekî serketî derketiye pêş, ji ber hesûdiya Louisê XIV. bi fermana wî hatiye girtin û La Fontaine tûşî êşên nedîtî hatiye. Wî jî dêhn û bala xwe li ser nivîsandinê zêde kiriye, berhemên bi navên élégie aux Nymphes de Vaux û Contes et Nouvelles nivîsandine.

"*Bi keldûmanên bêdeng diherikin re,*
*Bi danîna kulîlkan,*
*Serê wî li ser piyên wî û piyên wî li ser ewran...*"

Lê ev berhemên wî zêde bala mirovan negirtine ser xwe. Zewaca wî ya bi keçeke 15 salî re, çêbûna zarokek wan û nelihevkirinên jin û mêrtiyê bandoreke din li ser wî hiştiye. Herî bêtir qayişkêşanên wî û Louisê XIV. ew ber bi jiyaneke bohemî ve dehf daye. Li dû hev bi jinên cuda re danûstandinên wî yên evînî pêk hatine. Hewldana wî ya ji bo xweîsbatkirinê di warê nivîsandina helbestê de çêbûye. Lê li dû temenekî dirêj, destavêtina nivîsandina xeberoşkan bûye sedem ku ew bigihîje mertebeya kamilbûnê.

Ji sala 1668'an heta sala mirina xwe -ku teqrîben 25 sal in- [1668 şeş cildên xeberoşkan, 1678 pênc cildên xeberoşkan û 1694 cildek xeberoşkan], berhemên xwe yên herî navdar xeberoşk (meselokên sewalan) afirandine. 238 xeberoşk di 12 pirtûkan de civandine. Wî 18 çîrokên ji pirtûka Kelîle û Dîmne wergirtine û ew ji nû ve bi zimanekî helbestî pêşkêş kirine. Mijarên xeberoşkên wî ji çîrokên erdnîgariya Rojhilatê hatine wergirtin. Wî di van xeberoşkan de bi behskirina xerabiyan xwestiye peyama başiyan ragihîne mirovan. Ji ber hindê mirovên Rojhilatî û kurd ne xerîbên van xeberoşkên wî ne. Dîk, rovî, gur, şêr, ker û sewalên dîtir ên di van xeberoşkan de, di meselokên kurdî de jî hene.

Gelo mirovekî jiyana wî ew qas girîft çima fabl nivîsandine? Jean de la Fontaine di sala 1684'an de ketiye Académie française û li wê derê tev li nîqaşa mezin a wêjeyê ya dawiya sedsala 17. bûye: Pevçûna navbera xwedî fikra nûjen û xwedî fikra kevin. Di bin pêşengtiya Charles Perrault (helbestkar, nivîskar, teorisyenê wêjeya fransî) de wêjeya nû û nûjen dihat parastin û La Fontaine jî di koma duyem a kevnparêzan de cih girtibû. Li gora fikra wî, divê afirandina wêjeyê pişta xwe bisparta nivîskarên klasîk ên serdema antîk. Û wî li ser vê fikrê xeberoşkên sewalan ên naveroka wan tevgerên mirovan afirandine.

La Fontaine di 13'ê Nîsana 1695'an de li odeya otelekê miriye. Nivîsa ser gorîçeya xwe beriya mirina xwe amade kiriye:

"Jean çawa hat, wiha çû. Li dû dahata xwe ji yên kîsê xwe dixwe. Hewce ye ji tiştên baş were bawerkirin. Dema ber bi dawiyê ve dizanîbû dê çawa belav bike. Du tişt kirin: ji bo xerc bike, vexwar; tişta dîtir jî nekirina tu tiştî."

***

Ahmedê Xanî nivîskarekî pirziman bû û di serdema wî de li ser erdnîgariya Kurdistanê serdestiya zimanên farisî û erebî li pêş bûn, û wî li ser armancekê berhemên xwe bi zimanê kurdî afirand ku ew nirxê zimanê xwe mayînde bike. Mîrektî û pêşengên kurdan di helwesta wî de negihan û qîmetê nivîs û afirandinê fam nekirin. Her wiha parçebûn û berbelavbûna mîrektiyên kurdan bû sedem ku ne çanda kurdan û ne jî berhemên wê çandê bigihîje çarnikarê cîhanê. Û sedemên dîtir nehiştin ku Xanî weke parçeyek ji mîrata wêjeya cîhanê were naskirin. Jixwe wî di malikek helbesta xwe de ev rewş wiha aniye zimên: "Binêr ji axa ereb ta gurcan/ welatê kurdan bûye wek bircan/ ecem û rom xwe bi wan diparêzin/ kurmanc jî li çar aliyan rêz in." Xanî 370 sal berê hate jiyanê û digel hemû neyîniyên li dijî çanda urdî nav û nûtika wî hê jî dijî. Ew ê di 400 saliya bûyîna xwe (2051) de jî bijî.

Jean de la Fontaine nivîskarekî fransî bû û di serdema wî de li erdnîgariya Ewropayê zimanê wî bixwe serdest bû. Ji ber hindê hemû berhem û nivîsên wî bi xwezayî derbasî nava milkên wêjeya cîhanê dibûn. Wî jî li ser xîmê klasîkê afirand û berhemên wî heta niha jî li her derên cihanê têne xwendin û belavkirin. Gotin, jiyan û berhemên wî bi hêminî têne pêşwazîkirin. Ew di 400 saliya bûyîna xwe de jî dijî.




La Fontaine.



Helîm Barîn


# Xwe bizane

Min nivîsa başî û xerabiyê bi hevoka "Sokrates ji bo wê jî fîlozofiyê pêşniyar dike." xelas kiriye. Îca ka em bipirsin çi ye ev fîlozofî ? Bi kêrî çi tê ?

Dema em dibêjin fîlozofî ji ber ku fîlozofî peyveke grekî ye ji ber xwe ve berê me diçe Atînayê (Heidegger). Em dibêjin Atîna lê bêtir em behsa derdora Deryaya Egeyê dikin. Salên Beriya Zayînê 400-500'î. Dîsa em kîjan pirtûka destpêka fîlozofiyê vekin, em ê vê hevokê bixwînin 'fîlozofiyê bi grekan dest pê kir.' Bi qasî ku tê zanîn ê ku cara ewil vê têgeha fîlozofiyê bi kar aniye Pythagoras e. Lê kesên ku dibêjin ne wiha ye jî hene. Peyva fîlozofiyê (philosophia) ji peyvên **philo** (hezkirin, dilketin, lêgerîn) û **sophia**'yê (zanyarî) hatiye çêkirin. Lê em ê bêtir bela û bala xwe bidin Sokratesî! Helbet beriya wî gelek fîlozofên giregir hebûn lê Sokrates tiştek dinê kir û bi vî awayî ciyê wî cuda bû. Ji ber wê ye navê wî bûye navê serdema fîlozofan: Presokratîk. Yanî fîlozofên beriya Sokratî. Beriya Sokratî pirsa fîlozofiyê bêtir li ser xwezayê bû. Lêgerîna destpêka her tiştî hebû. Motîvasyona vê lêgerînê meraq bû. Arîstoteles dibêje "Mirov ji xwezaya xwe ve meraq dike". Helbet bi qasî meraq motîvasyona debarê jî hebû. Lê kêm zêde hemû fîlozof li dû arkheyê bûn. Arkhe yanî rêgez-binyad-destpêkpêşî. Destpêka vê xirecira dinyayê çi ye ? Ji çi çêbûn û bi ku va diçin. Pirs li ser ontoyê – he/bûnê bû. Mînak Thales dibêje **arkhe** av e, hemû tişt ji avê çêbûne û ew ê vegerin, cardin bibin av. Herakleîtos gotiye agir, Anaksimandros ji bo **arkhe** gotiye **Aperîon** yanî bêdawîtî.

Wekî Nietszche jî dibêje fîlozofî li wir yanî li Atînayê çand bû. Jixwe ji ber wê sebebê gelek pirtûkên fîlozofiyê destpêka fîlozofiyê bi grekan didin destpêkirin. Lê ev nayê maneya ku li Rojhilata cîhanê kes serê xwe bi ramanê neêşandiye. Beriya Sokratesî (B.Z. 468-399) li Çînê Lao-tse (B.Z. 600) li Mezopotamyayê Zerdeşt (B.Z. 632) hebû. Lê li Atînayê ne ku fîlozofî hebû, li wir fîlozofî bûbû çand. Çawa niha li binê her bînayî qehweyek heye û okey dilîzin a wê demê jî li her serê kuçeyê mirov kom dibûn û pirsan ji hev dikirin. Çîroka Sokrates jî mirov dikare ji wir berdewam bike.

Sokrates jî yek ji wan kesan bû ku diçû kuçeyan û bi fîlozîfiyê dadiket. Heta em dikarin bibêjin ku kuçe nedima ku Sokrates neçe û xwe tev li civatan neke. Îdîa ew e ku kahînek dibêje "Sokrates kesek herî zana ye". Sokrates jî dibêje heyran wele ez ne zana me. Lê ji ber ku kahîn temsîliyeta xwedê dike, divê bawer bike, ji ber wê dikeve şikê û bi pirsên xwe li civatan kesên ji xwe zanatir digere. Lê haho çi bibîne! Kesên ku ji xwe re dibêjin zana, bi çend pirsan têk diçin. Hay jê nînin ku hemû zanebûna wan şaş e. Sokrates wê caxê li ser gotina kahîn dirame û dibêje qet nebe ez nezanîya xwe dizanim û ev hevoka bi nav û deng derdike ji devê wî: "Tenê tiştê ku ez dizanim ev e ku ez bi tiştekî nizanim". Ên din vê jî nizanin. Bi vî şeklî zanîna sînora zanebûna xwe dibe zanîna herî bi qiymet. Loma şagirtê wî Platon li ser derîyê dibistana xwe dinivsîne 'Xwe Bizanibe'. Helbet girîngiya Sokrates ne tenê ev bû. Sokrates berê pirsê guherand û jê pê ve rengê fîlozofiyê guherî. Berîya wî berê pirsê li xwezayê bû. Sokrates berê pirsê zivirand û da hêla mirov. Pirsa Dilpakî (virtue) bû pirsa sereke û etîk bû navenda fîlozofiyê. Piştî hezar salan Nietszche bi hemû qehra xwe vê rewşa Sokratî wekî dekadans yanî wek rizîna ehlaqî şîrove kir. Mirov li ser wê dema antîk û rêya ku fîlozofî diçû difikire heya ciyekî tev li Nietszche dibe. Ji ber ku piştî Sokrates rêya fîlozofiyê guherand ji wir îdealîzma Platonî derket. Îdealîzma Platonî nêzî hezar sal fîlozofiyê mijûl kir. Loma fîlozofa Îngîlîz A.Whitehaed dibêje: "Hemû fîlozofiya rojavayî ji Platon re jêrenotek e." Ne bi tenê fîlozofî, dînên wek Xiristîyanî û Îslam jî çavkaniya xwe ji wir girtin. Zanistiya ku beriya Sokratî xwe di nav fîlozofiyê de ber dabû xwe veşart. Carna dema serê xwe radikir, dihat poşmankirin. ( Bîranîna Brunoyî ev e) . Lê li gel van jî em nikarin hemû jirêderketinên dîrokî bikin stûyê Sokratesî. Li gor dema xwe û serpêhatiyên xwe wer lê hat. Sokrates bi pirs û diyalogên xwe li kuçeyên Atînayê bû bela serê desthilatdaran. Desthilatdaran hewl dan wî li agorayan bidarizînin lê ew bi parznameya xwe ya bi nav û deng desthilatdarên pûç û rizî darizand û berdêl mirin be jî lê ji ya xwe daneket. Loma jî ew wek şehîdê heqîqetê tê şîrovekirin. Welhasil bi kurt û kurmancî ji bo Sokratesî, fîlozofî xebata xwe zanînê ye. Bizane da ku xerabiyê neke, xerabiyê neke da ku bibî bextewar. Lê ev xwe-zanîn çi ye ? Mirov çawa dikare xwe bizanibe? Em ê bi van pirsan berdewam bikin.



# Girtiyên nexweş diavêjin karantînayê

Navenda Nûçeyan



Li girtîgehan mafên girtiyan ên paqijî, tenduristî, xwarin, av, ragihandinê tên binpêkirin. Girtiyên daxwaza mafê xwe dikin, daxwazên wan bê bersiv tên hiştin. Girtiyên nexweş nayên dermankirin û terkî mirinê têne kirin.

Komeleya Civaka Sivîl a di Pergala Înfaza Ceza de (KCSPÎ-CÎSST), di meha tebaxê de raporek li ser rewşa girtî û girtîgehan amade kir. KCSPÎ'yê li gorî serlêdanên girtî û malbatên girtiyan dane komkirin û rapor amade kir. Komeleyê ji destpêka şewba vîrûsa coronayê (Covîd-19) heta tebaxê ji 143 girtîgehên cuda serlêdanên girtiyan û malbatan girtin. Ji 143 girtîgehan 94 girtîgehên sergirtî û 49 girtîgehên vekirî ne. Komeleyê di beşa Kapasîteya Girtîgehan de bal kişand ser hejmara zêde ya girtiyan û wiha cih da raporê: "Li qawîşên girtiyan hejmar pir zêde ye. Doşekên wan pir nêzî hev in û ev rîska şewba vîrûsê zêde dike. Ji ber hejmar zêde ye, nikarin li dûrî hev razên.

**Amûrên paqijiyê nadin girtiyan**

Komeleyê di sernavê rewşa paqijiyê de bal kişand ser mafê girtiyan ên paqijiyê û wiha li raporê zêde kir: "Di destpêka şewba Coronayê de girtîgeh bi rêk û pêk dihat dezenfektekirin. Lê di demên dawî de êdî zêde dezenfekte nayê kirin. Li girtiyan doşek, betanî û şeltên qirêj didin girtiyan. Di nava betanî û şeltên ku li girtiyan belav dikin de kêzik hene. Amûrên paqijiyê nadin girtiyan. Deriyê qawîşê zêde venakin û hewa paqij nadin hundir. Şibakeyên qawîşan biçûk in û bi qasî tê xwestin ode hewaya paqij nastînin. Gardiyan di jimartinê de li gorî pîvanên mesafeya civakî tevnagerin."

**Avê ji ser girtiyan qut dikin**

Komeleyê di raporê de bal kişand ser alav û amûrên ku difiroşin girtiyan jî û ev agahî di raporê de parve kir: "Li hin girtîgehan rêveberî sabûn, ava cilşoyan û dezenfektanê difiroşin girtiyan. Yên ku bê pere dide jî pir hindik didin. Girtiyên ku nikaribin bikirin, ji mafê amûrên paqijiyê bêpar têne hiştin. Rûpoşan nadin girtiyan. Rûpoşên li girtiyan têne belavkirin jî mirovan naparêzin. Li gelek girtîgehan amûrên paqijiyê naxin destşo û serşoyan û qirêj têne hiştin.

Li hin odeyan serşo û tuwalet tune ye. Li hin girtîgehan ava qirêj didin girtiyan. Dem bi dem av ji ser girtiyan tê qutkirin û ava germ pir hindik didin girtiyan. Li hin girtîgehan avê bi sînor didin girtiyan.

**Xwarina paqij nadin girtiyan**

Komeleyê di sernavê xwarin û vexwarinê de jî bal kişand ser xwarina bêqalîte û wiha lê zêde kir: "Li hin girtîgehan xwarina baş nadin girtiyan. Xwarina sar û ne paqij didin wan. Girtiyên ku nikaribin vê xwarinê bixwin neçar dimînin ku pêdiviyên xwe ji kantînê temîn bikin. Bêtir savar, riz û xwarina bifêkî didin girtiyan. Xwarina li qantînê tê firotin jî pir buha tê firotin. Dîsa xwarina li gorî diyetê nadin girtiyan.

**Xwe nagihînin bijîşkan**

Komeleyê di sernavê tenduristiyê de jî bibîr xist ku girtî nikarin ji mafê tenduristiyê sûdê bigirin. Komeleyê bal kişand ser rewşa girtiyên nexweş û wiha got: "Ji bo girtiyên nexweş û kal tedbîr nayên girtin. Girtî bi xwe amûrên paqijiyê distînin. Li hin girtîgehan bijîşk naçin revîrê. Girtî ji Wezareta Tenduristiyê re daxwaznameyan dişînin, lê daxwazên wan bê bersîv tên hiştin. Girtiyên nexweş li şûna karibin biçin revîrê û rû bi rû bijîşk bibînin, bi daxwaznameyan nexweşiyên xwe ji bijîşk re radigihînin. Bijîşk jî li gorî daxwaznameyê derman ji girtiyan re dişîne. Girtiyên bi şewba Covid-19'ê dikevin jî dema ku wan dibin nexweşxaneyê bêyî wan test bikin, îlacan didin wan û paşve dişînin. Gelek girtî nikarin biçin nexweşxaneyê. Gelek girtî jî nikarin xwe bigihînin dermanên ku bi rapora heyetê têne standin. Girtiyên ku gelek nexweşî bi wan re hene tenê dikarin ji bo nexweşiyekê biçin cem bijîşk.

Gelek girtiyên bi nexweşiya pençeşêrê ketine, li şûna bi rêk û pêk bêne dermankirin, nexweşiya wan bi rêk û pêk nayê şopandin. Girtî dîsa nikarin derman bistînin. Girtiyên diçin nexweşxaneyê jî wan bi kelepçeyan dibin û tînin û tevî kelepçeyan tedawî dikin. Gelek girtiyên nexweş bi hev re dixin rîngê û demek dirêj wan di rîngê de didin hiştin.

**Di karantînayê de li erdê radizên**

Girtiyên nexweş ku ji nexweşxaneyê vedigerin heta 14 rojan di karantînayê de tên hiştin. Ji ber vê yekê gelek girtiyên nexweş naxwazin biçin nexweşxaneyê. Girtiyên nexweşiya wan giran jî dema ji nexweşxaneyê vedigerin, di hucreyê de têne girtin û nikarin bi sere xwe pêdiviyên xwe temîn bikin.

Girtiyên nikarin bi serê xwe bimînin jî dîsa di karantînayê de têne girtin. Girtiyên di karantînayê de dimînin nikarin ji mafê tenduristiyê sûdê bigirin. Hin girtî ji ber şewba vîrûsê 15 rojan zêde di karantînayê de dimînin. Li girtîgehan kawîşên karantînayê ne paqij in. Li hin odeyan gelek girtî bi hev re dimînin. Gelek girtî li erdê radizên. Nikarin ji mafê rojname, radyo, TV, pirtûkan sûdê bigirin. Mafê wan ê telefonê tê astengkirin.

**Rewşa hin nexweşên giran**

Hayatî Deniz Kaytan li girtîgeha Tîpa F a Boluyê girtî ye. 18 sal in girtî ye. 16 sal in di hucreyê de girtî ye. Ji sedî 60 rapora wî ya astengdariyê heye. Bi nexweşiya kronîk e.

Serdal Yildirim li Girtîgeha Tîpa R a Metrîsê girtî ye. Felç bûye. Bi palpişta bi teker tevdigere. Nikare destava xwe bigire. Saziya Tipa Edlî di raporê de diyar kiriye ku bi tena serê xwe nikare bijî. Lê tevî raporê bi hinceta 'Ewlehiya civakê dixe xetereyê' nayê berdan.

Abdurrahim Demîr li girtîgeha Tîpa F a Edirneyê girtî ye. 58 salî ye. 26 sal in girtî ye. Bi nexweşiya gurçikê ya kronîk e. Di hucreyekê de tê girtin. Demîr nikare bi serê xwe bijî.

Mehmet Salîh Fîlîz li Girtîgeha tîpa T a Odemîşê ye. 23 salî ye. Bi nexweşiya pençeşêra roviyan ketiye.

Denîz Yildirim li Girtîgeha Hêjmar 1 a Ewlehiya Bilind a Xarpêtê ye. 4 sal in girtî ye. Ji roviyan emeliyata pençeşêrê bû. Hin roviyên wî li derve ne. Tedawiya kemoterapiyê didomin.

Abdulsamet Durak li Girtîgeha Tîpa L a Hêjmar 1 a Turkoglu ye. Qeyrana dil derbas kir. 3 rojan li nexweşxaneyê bi kelepçeye hat dermankirin.

Mehmet Emîn Ozkan li Girtîgeha Tîpa D a Amedê girtî ye. 82 salî ye. Bedena wî ji sedî 87 erka xwe winda kiriye. Nexweşiyên Alzheimer, guatr, tansiyon û dil pê re hene. Heta niha 5 caran qeyrana dil derbas kiriye. 4 caran anjiyo bûye. Di 10 rojan de 7 caran bi kelepçeyê birin nexweşxaneyê. Tevî hemû rapor û serlêdanan Ozkan nayê berdan.

**Girtî di tecrîdê de ne**

Girtî nikarin ji mafê xwe yê telefonê bi rêk û pêk sûdê bigirin. Bi hinceta şewba Coronayê girtî nikarin bi malbatên xwe re hevdîtinên rû bi rû bikin. Hevdîtinên girtî yên saetekê daxistine 35-40 deqîqeyan. Girtî ji ber li girtîgehên dûrî malbatê ne, malbat nikare biçe hevdîtinên wan. Mafê girtiyan ên pirtûkxaneyê û qada hevpar tê astengkirin. Dema girtî bi rêya telefonê giliyên xwe dikin û malbatan agahdar dikin, telefon li ser wan tê girtin. Îtîraz û daxwazên girtiyan nayên qebûlkirin. Bi cezayê dîsîplînê gefan li girtiyan dixwin. Nameyên girtiyan hin caran 30-40 rojan dereng didin girtiyan. Hin girtî nikarin bi rêya kargoyê alav bişînin û bistînin.

---



Xweşkanî

Felemez Ulug

## Li Rojhilata Navîn planên nû

Li Rojhilata Navîn pêşveçûnên pir girîng tên jiyîn. Ev hevdîtinên dîplomatîk îşaret bi pêşveçûnên nû dikin. Wisa diyar e ku wê ev hevdîtin bidomin jî.

Di 28'ê tebaxê de Bexdayê ji civînek girîng re mazûvanî kir. Di civîna lûtkeya Bexdayê de nûnerên 7 welatan li hev civiyan. Mijara sereke jî ew bû: 'Ka Iraq çawa dikare aram bibe yan jî li aramiyê vegere'. Lê dema me dît ku dewleta tirk jî tev li vê civînê bûye, xuya ye ji bilî aramiyê wê her tiştî bibe.

Kongreya Lûtkeya Welatên Cîran, bi beşdariya nûnerên Siûdî, Kuwêt, Tirkiye, Urdun, Amerîka û Fransayê pêk hat. Vê civînê piştî pêşveçûnên nû yên li Afganîstanê ve girêdayî planên hêzên mêtinger ên li ser Rojhilata Navîn anî rojevê.

Piştî hevdîtinê Serokkomarê Fransa Emmanuel Macron serdana herêma Kurdistanê û Mûsilê jî kir. Di van serdanan de Macron peyamên girîng da. Her çendî naveroka peyamên wî aborî û binesaziya herêmê bû jî serdana wî ya van herêman peyama herî girîng bû.

Piştî vê civînê têkiliyên Tirkiye û Misirê yên ku ev 8 sal in hatibûn rawestandin ji nû ve germ bûn. Di bin navê aramkirina rewşa heyî de bi navbeynkariya hin welatên cuda cara yekem her du welat di meha gulanê de li Kahîreyê li hev civiyan. Tûra duyem jî di 7 û 8'ê îlonê de li Enqereyê pêk hat.

Ev hevdîtin ji bo hesabên dewleta tirk ên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jî girîng bû. Lewma bi sistbûna hevdîtinan ve Misir têkildarî rewşa kurdan peyamên germ dan Sûriye û Iraqê, lê di vê demê de bêdengiya wê nayê wê wateya ku ji van hevdîtinên heyî razî ye.

Bi van pêşveçûnan ve girêdayî agahiya ku dê şefê MÎT'a tirk Hakan Fîdan bi hempîşeyê xwe yê dewleta Sûriyeyê Alî Memluk re li Bexdayê li hev bicivin ket rojevê. Her çendî ev agahî nehatibe piştrastkirin jî ji aliyê her du hêlan ve nehat derewandin jî. Ev jî tê wateya ku di navbera her du aliyan de hevdîtin çêdibin.

Lê ji ber heya niha dewleta tirk polîtîkaya xwe ya Sûriyeyê li ser çeteyan ava kiribû û bi rêya çeteyan hebûna xwe li ser herêmê ferz dikir, bi van pêşveçûnan wê êdî nikaribe mîna berê li herêmê piştevaniya komên çeteyan bike. Ev jî hesabê dewleta tirk xera dike.

Bêguman ji gelek aliyên cuda ve nirxandinên ku di bingeha van hevdîtinan de dijminantiya dewleta tirk a li dijî gelê kurd heye tên kirin. Lê aliyekî din yê vê trafîka hevdîtinên siyasî jî Rêvebiriya Xweser e. Hat ragihandin ku wê şandeyek ji Rêvebiriya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di rojên pêş de wê bi rayedarên Amerîka û Rûsyayê re rêzehevdîtinan pêk bîne.

Her çendî der barê naveroka van hevdîtinan de agahiyeke piştrastkirî nebe jî tê texmîn kirin ku wê di van hevdîtinan de rewşa siyasî ya herêmê û polîtîkaya dewleta tirk ya dijkurd û êrîşên wê bên guftûgokirin.

Tê payîn ku şandeya Rêvebiriya Xweser bi Nûnerê Amerîkayê yê Rojhilata Navîn Brett McGurk, Alîkarê Wezîrê Karê derve yê Rûsyayê Sergey Fryshînîn û Cigirê Serok Dewletê Rûsya Aleksander Lavrentiyev re li hev bicivin.

Bi van pêşketinan ve girêdayî li Hewlerê jî hevdîtineke balkêş pêk hat ku divê mirov binirxîne. Ji CHP'ê şandeyek di bin serokatiya Cigirê Serokê giştî yê CHP'ê Oguz Kaan Salici de çû Hewlerê û bi Serokê giştî yê PDK'ê Mesûd Berzanî û partiyên siyasî yên herêmê re hevdîtinek pêk anî. Ev cara ewil e ku ji aliyê CHP'ê şandeyeke wisa payebilind serdana Herêma Federe ya Kurdistanê dike û hevdîtinan pêk tîne.


Têkildarî vê hevdîtinê ku bala gelek aliyên cuda kişandiye, tê gotin ku amadekariyeke ji bo hilbijartinê ye.

Lê kesên ku vê hevdîtinê wek polîtîkayeke dewleta tirk dibînin jî hene. Tê gotin ku bi vê hevdîtinê re dewleta tirk dixwaze di siyaseta xwe ya li dijî kurdan de bi dewrê derketina AKP'ê ve CHP'ê têxe dewrê.

Bêguman bi vê ve jî girêdayî dewleta tirk peyamekê dide aliyên sermeyadar jî. Lewma ji aliyê din ve ev hevdîtin wek temînata têkiliyên dewleta tirk û başûrê Kurdistanê ên di warê aboriyê de û peymanên hatine kirin de jî tê dîtin. Lê gelek kesên ji bo selametî û pêşeroja kurdan bawerî bi hevdîtinên vî rengî nakin jî hene. Lewma ne gengaz e ku mirov ji van hevdîtinên ku bi aqilê dewleta faşîst ve tên lidarxistin hêviyek mezin bike. Ji ber ku di bingeha zihniyeta dewleta dagirker de înkara kurdan heye, nabe ku di van hevdîtinên bin siya wê de çêdibin encamekî erênî derkeve holê. Ji van hevdîtinan encamekî baş hêvîkirin bi temamî xwe xapandin e.

Bi van pêşketinan ve girêdayî Berpirsê Siyaseta Derve ya Yekitiya Ewrûpa Josep Borrell jî serdana Iraqê kir. Josep Borrell wê li Bexdayê bi Wezîrê Karê Derve yê Iraqê Fuad Husên û li Hewlêrê bi Mesûd Barzanî re li hev civiya.

Wisa diyar e ku di vê trafîka diplomatîk de mîsyonek dane PDK'ê jî. Ji lewra PDK di siyaseta xwe ya dijkurd de wisa agresîf û hişk e. Êdî ji bo dema pêş bi çi gotin û xeyalan ew xapandine ne diyar e. Lê tişta diyar e ew e ku ji bo di pêşxistina vî planî de Tevgera Azadiya Kurdistanê nebe xwedî gotin pêşî li êrîşên dewleta tirk vekirine. Bi van êrîşan re dixwazin bandora PKK'ê ya li ser herêmê kêm bikin û wê têxin rewşekê parastinê ku ji rojeva heyî dûr bixin.





# Lûtkeya Bexdayê

Serdem Silo

Beriya ku em behsa naveroka konferansa dewletên cîran an lûtkeya Bexdayê ya hevkariyê ku di 28 tîrmeha borî de hatiye lidarxistin bikin, divê em behsa konferansa 'hevbendiya Bexdayê' ku di salên 1950'yî yên sedsala borî de hatiye lidarxistin, bikin. Nemaze armancên her du konferansan ew e ku ji bo Rojhilata Navîn û li herêmên em li ber deriyê îmzekirina hevpeymanên nû ne û bi taybet li welatê Şamê pêvajoyekê bidin destpêkirin.

**Rêçên Hevbendiya Bexdayê 1955**

Di nîvê salên 50'yî yên sedsala borî de avakirina 'Hevbendiya Bexdayê' ku li rex Birîtanyayê, Iraq, Tirkiye, Pakistan û Îranê tê de cih digirtin, hate ragihandin. Armanca hevbendiyê jî ew bû ku wan dixwast di dema şerê sar ê wê demê de rê li ber pêşvehatina Sovyetê bigirin.

Hevbendiya Bexdayê yek ji sedemên darbeya 1958'an e ku desthiladariya padîşahiyê li Iraqê hilweşand û Ebdilkerîm Qasim di 24'ê adara 1959'an de vekişîna Iraqê ji Hevbendiyê ragihand ku sala xwe ya çaremîn derbas nekiribû û navê wê bi navê 'Hevbendiya Navendî' hate guhertin. Piştî ku şerê sar di navbera Amerîka û Yekitiya Sovyêtê de dest pê kir, dewletên rojavayî dîtin ku divê Rojhilata Navîn di bin hegemonya û serweriyê de bimîne. Çunkî xala girêdana di navbera rojhilat û rojava de ye û ji aliyê petrol û gelek madeyên xwezayî ve jî dewlemend bû. Pakistan, Îran, Tirkiye, Iraq û Birîtanyayê erê kirin ku di nava hevbendiyeke ewlehî ya komî de bimînin û Amerîka jî çavdêriya wê bike. Hevbendiyê li Bexdayê rûniştina xwe ya yekemîn li dar xist û ji ber wê navê wê bû Hevbendiya Bexdayê. Beşdarbûna Birîtanyayê jî di dema bidawîbûna hevpeymana 1930'yî ya bi Iraqê re di nîsana 1954'an de çêbû, lê Amerîkayê nexwest beşdar bibe û tenê xwest alîkarî û çavdêriya wê bike.

Gelek civîn bi Misirê re bi serkêşiya Cemal Ebdilnasir re hatin lidarxistin da ku wî bi beşdarbûnê razî bikin. Lê Misirê red kir. Dewletên rojavayî jî baş dizanîbûn ku eger Misir erê bike, ereb jî dê erê bikin. Dema ku Ebdilnasir serê xwe hişk kir, berê xwe dan hevkarên xwe li Bexdayê û îmzekirina hevbendiyê û erêkirina wê ji meclisa neteweyî ya Iraqê rastî nerazîbûna gel hat û êdî hilweşandina 'Hevbendiya Bexdayê' bû diruşmeyek.

Yek ji armancên girîng û daxwaza avakirina hevbendiya Bexdayê ew bû ku li hemberî pêşvehatina komûnîstan derkeve. Daxwaza Iraqê ya beşdarbûna vê hevbendiyê girêdayî hevbendiya bi Birîtanyayê re bû. Her wiha Iraqê jî dixwest sûd ji vê hevbendiyê werbigire da ku çekan bi dest xwe bixe. Hevbendiyê jî gelek komîte ava kirin. Hin ji wan ev in: Komîteya Leşkerî, Komîteya Aborî, Komîteya Peywendîdar, her wiha lihevkirinek pêk hat ku hemû biryarên Hevbendiyê divê bi dengan giştî pêk werin.

Li ser asta leşkerî jî, hevbendiyê tu çalakiyeke leşkerî ya hevbeş pêk neanîn. Tenê hin serdan di çarçoveyeke leşkerî û perwerdeyê û dayîna çekan ji dewletên hevbendiyê re pêk hatin. Lê di warê aborî de komîteyên şaxî yên girêdayî aliyên aborî hatin avakirin, lê xebatên wan ne zelal û girîng bûn.

Hevbendî nikaribû bi rola ku wekî tê xwestin rabe. Ji ber ku hin rejîmên wekî Iraq û Îranê ne razî bûn. Her wiha rikberiya herêmî ya tund hişt ku rikberiyeke hundurîn jî li van dewletan derbikeve; wekî çalakiyên neteweyî yên bi serkêşiya Misirê û çalakiyên komûnîst bi serkêşiya Yekitiya Sovyetê.

**Rûbirûman û qayîşkêşana aliyan**

Iraq û Birîtanya û Amerîka hewl dan dewletên ereb beşdarî nava hevbendiyê bibin, lê van hewldanên ronahî nedîtin û berovajî wê hişt ku hin dewletên ereb li dijî hevbendiyê bixebitin. Nemaze Misir û Erebistana Siûdî. Yek ji sedemên nerazîbûna dewletên ereb a beşdarbûna nava hevbendiyê pêşbirkiya li ser serokatiya herêmê bû. Her wiha dijminahiya wan a hişk ya li hemberî rejîma siyasî li Iraqê û bi taybet Nûrî Seîd ku navenda siyaseta navneteweyî û herêmî bû.

Beramberî teşwîqkirina Misir û Sûriyeyê ya ji bo yekitiya xwe di bin navê 'Komara Erebî ya Yekbûyî' de ava bikin, Bexda û Umanê 'Yekitiya Erebî' ava kirin ku ew jî têk çû. Li ser asta Iraqê, Hevbendiyê hişt ku raya giştî ya Iraqê ji rêveberiya xwe ya siyasî dûr bikeve û bi taybet piştî êrîşa sêalî ya li dijî Misrê û li Iraqê xwepêşandanan dest pêkirin û daxwaz ji Nûrî Seîd dikirin ku ji Hevbendiya Bexdayê vekişe. Lê tenê taloqkirina beşdarbûna Birîtanyayê di civînên Hevbendiyê de ragihand da ku xwepêşanderên Iraqî hêdî bike. Lê yek ji sedemên bidawîbûna rêjîma padîşahtiyê li Iraqê û vekişandina Iraqê ji Hevbendiyê di 24'ê adara 1959'an de bû. Ebdilkerîm Qasim xwe spart siyaseteke bêalî û têkiliyên dîplomasiyê bi Yekitiya Sovyetê re ava kirin. Piştî ku Iraq ji Hevbendiyê vekişiya, êdî navê Hevbendiyê jî hate guhertin û bû 'Rêxistina Peymana Navendî' û navenda Hevbendiyê ji Bexdayê ber bi Tirkiyeyê ve hate veguhestin.

Pakistanê jî di şerê xwe yê li dijî Hindistanê de, li Keşmîrê alîkariya hevbendiyê wernegirt. Tirkiyeyê jî piştî ku başûrê Qibrisê di sala 1974'an de dagir kir ,alîkariyên leşkerî yên ji dewletên rojavayî werdigirtin winda kir. Piştre jî rêjîma Şah li Îranê hilweşiya û bîrdoziya Îranê hate guhertin û ji dewletên rojavayî dûr ket, ji ber van hemû sedeman Hevbendî di sala 1979'an de bi dawî bû.

**Konferansa Bexdayê ya 2021'ê**

Serokwezîrê Iraqê Mustefa El-Kazimî piştrast kir ku dewletên beşdarî 'Konferansa Bexdayê ya Hevkariyê' bûn, ji bo rûpelekî nû bi Sûriyeyê re vebikin erê kirine. Her wiha destnîşan kir ku 'şeş lihevkirin di navbera dewletên herêmê de' pêk hatine û got ku beşdaran li hev kirin ku rûpelekî nû bi Sûriyeyê re vebikin.

El-Kazimî di berdewama axaftina xwe de got ku xebatên Iraqê di lûtkeyê de hişt ku şeş lihevhatin di navbera dewletên beşdarî lûtkeyê de pêk werin û wiha domand: "Di çarçoveya lûtkeyê de Siûdiyê, Îran, Misir û Qeterê civîn li dar xistin, her wiha gelek civînên din ku hê nehatine aşkerakirin hene".

Lê naveroka lûtkeyê di tûra wê ya yekemîn de weke propagandayekê ji El-Kazimî û hikûmeta wî re bû ku dikare kaxezan li Rojhilata Navîn tevlîhev bike. Bi taybet li welatê Şamê, da ku piştî hilbijartinan ku tê payîn di 10 cotmeha bê de werin lidarxistin, hikûmetê bi dest xwe ve bîne. Her wiha dezgehên çapemeniyê yên veşartî yên girêdayî El-Kazimî jî bê navber tevdigerin û propagandaya wî di hundirê Iraqê de dikin. Em dikarin bibêjin ku ev lûtke di asta herî jor de propagandaya El-Kazimî û hikûmeta wî ye. Nemaze ji ber ku zarokê delal li ba Amerîka û dewletên rojavayî ye.

**Stratejiya lûtkeya Bexdayê**

Me di destpêka vê nivîsê de behsa 'Hevbendiya Bexdayê' ku di salên 50'yî yên sedsala borî de hatiye damezirandin kir, lê dema em li dewletên beşdarî Hevbendiya Bexdayê û Lûtkeya Bexdayê ya Hevkariyê bûne temaşe dikin, diyar dibe ku evan dewletên beşdar piştî 62 salan ji Hevbendiya Bexdayê zêde bûne. Lê di vê serdemê de Amerîka serokê Fransayê wekilandiye da ku konferansê li şûna Birîtanyayê bi rê ve bibe. Her wiha stratejiyên wê yên aşkera dişibin hev, bi taybet di aliyê leşkerî û ewlehî û normalîzekirina têkiliyên di navbera dewletan de. Armanca sereke ya Hevbendiya Bexdayê rêgirtina li pêşiya pêşvehatina Yekitiya Sovyetê bû, lê Hevbendiya Bexdayê têk çû ji ber ku dewletên beşdar berdewam di nava nakokiyên berjewendiyan de bûn. Nemaze berê hin dewletên erebî ber bi siyaseta Sovyet ve bûn.

Lê di lûtkeya Bexdayê ya niha de armancên sereke nehatine aşkerakirin. Eger em li daxuyaniyên ku Siûdiyê, Fransa û Misirê dane binhêrin, hemû li dijî Îran û Tirkiyeyê ne. Ji ber ku pêşvehatina wan li herêmê aşkera ye û destwerdana gelek dewletên herêmê dikin da ku ajandayên xwe li herêmê pêk bînin. Daxuyaniya serokê Fransayê li Mûsilê ji ber ku nêzî baregeha Tirkiyeyê ya Nînowa ya li Iraqê ye (baregeha Başîqa) û baregeha komên çekdar ên Iraqê ku alîgirtiya Îranê dikin, sedema sereke ew e ku koçber venagerin û bi taybet êzidî rastî êrîşên berdewam ên Tirkiyeyê tên".

Dewletên beşdarî lûtkeyê bûne berdewam bi dewleta Tirkiye û Îranê re di nava nakokiyan de ne û bi taybet piştî ku destwerdana herêmên Rojhilata Navîn kirin û gelek dever dagir kirin. Her wiha hin ji beşdarên lûtkeyê hewl didin serokatiya Rojhilata Navîn di vê serdema nû de bi dest xwe ve bînin û bi taybet Misir û Siûdiyê. Diyar e ev hevbendî tevî dijminahiya li hemberî Tirkiye û Îranê nikare tu encaman bi dest xwe ve bîne. Ji ber ku rêjîmên erebî li Rojhilata Navîn nikarin pêşvehatina Tirkiye û Îranê ku alîkariya xwe ji Rûsya û Çînê werdigirin, rawestînin. Ev her du dewlet jî pêşvehatina Amerîka li Rojhilata Navîn weke metirsî li hemberî berjewendiyê xwe dibînin.

Diyar e çarenûsa lûtkeya Bexdayê ya Hevkariyê heman çarenûsa Hevbendiya Bexdayê ya salên 50'yî yên sedsala borî ye. Ji ber ku dewletên beşdar di nava hevûdu de bi nakok in û girêdayî ajandayên derve ne, beşek ji van dewletên beşdarî girêdayî siyasetên Amerîka ne û yên din girêdayî siyaseta Rûsya û Çînê ne. Dibe ku di warê aboriyê de hin encam li Iraqê werin bidestxistin. Ji bilî wê ev lûtke tenê propagandayeke girîng ji El-Kazimî û hikûmeta wî re ye û hêzekê dide wî da ku beşdarî hilbijartinên parlemanê bibe ku tê payîn di 10 cotmeha bê de bêne lidarxistin.

# Piştperdeya hevdîtinên Misir û Tirkiyeyê

Navenda Nûçeyan

Li ser daxwaza Wezareta Karên Derve ya Tirkiyeyê heyeteke ji Misirê serdana Tirkiyeyê kir û civînekê bi rayedarên tirk re pêk anî. Li gorî agahiyên Wezareta Karên Derve ya Misirê heyetek ji dîplomatên Misirê bi Serokatiya Cîgirê Wezîrê Karên Derve Hemdî Loza serdana Tirkiyeyê kir û rojên sêşem û çarşema borî bi rayedarên tirk re hevdîtin kirin.

Li gorî agahiyên malpera Sky News'ê hevdîtin der barê xalên ku bûbûn cihê nakokiyê di navbera her du welatan de pêk hat. Beriya çend mehan hin hevdîtin hatibûn kirin lê ji ber nakokiyên di hin mijaran de ew hevdîtin demekê hatibûn rawestandin.

Li gorî heman çavkaniyê sê xalên sereke ên ku li ser wan li hev nekiribûn ev in:

Yek ji wan xalan mijara vekişîna leşkerên tirk ji Lîbyayê ye, Misir daxwaz dike ku ew xwe ji Lîbyayê vekişînin. Li deryaya Spî bi tena serê xwe tevnegere û piştgiriya xwe ya ji bo rêxistina Ixwanan (Birayên misilman) bi carekê re rawestîne.

Ev her sê xalên bingehîn ên ku cihê nakokiyê ne di navbera Misir û hikûmeta tirk de ne.

**Bar li gorî keleka wan hilnehat**

Hikûmeta tirk pişta xwe bi rêxistinên îslamî û bi taybetî bi rêxistina Birayên Misilman xurt dikir ku bi riya wan serkêşiya Rojhilata Navîn bike. Lê wekî dibêjin hesabê malê û sûkê li hev nehat. Piştî têkçûna Ixwanan li Misrê, Lîbyayê û Tunisê hikûmeta tirk ji nişkan ve xwe tenê dît. Dît ku li hemû Rojhilata Navîn dost jê re nemane û rewşa wan a bi sifir pirsgirêk veguherî sifir têkiliyê.

Lewre jî niha hikûmeta tirk dixwaze hemû dîplomasiya xwe ji bo sererastkirina têkiliyên bi Misir, Erebistana Siûdî, Mîrîtiyên Erebî û welatên din ên Kendavê re bi kar bîne.



# Nexweşiya parkînsonê çi ye?

Fzt. Mustafa Onal

Parkînson, nexweşiyeke mejî ye. Ev nexweşî herî zêde li ser kesên temendirêj ango li kal û pîran peyda dibe. Nexweşiya parkînsonê di sala 1817'an de ji aliyê bijîşkê îngilîzî James Parkinson ve hatiye pênasekirin. Bijîşk Parkinson, nexweşiya parkînsonê wekî 'felca lerzokî' pênase kiriye û paşnavê xwe daye vê nexweşiyê.

Sedema derketina parkînsonê tunebûn an jî kêmbûna dopamînê ye. Dopamîn, parçeyeke kîmyasal e û bi awayekî xwezayî di laş de heye. Dopamîn di pêwendiya di navbera laş û mejî de dibe alîkar û mejî û laş ji hev haydar dike. Bi gelemperî di hemû xebatên me de jî bandora dopamînê heye. Li ser tevger, hişmendî, hînbûn, hişyarî, lêhûrbûn, hevsengî, rewşa derûnî û hwd. bandora dopamînê pir mezin e. Dema şaneyên dopamînê hildiberînin li rastî pirsgirêkan bên û nikaribin karên xwe bikin, dopamîn jî kêm dibe û hêdî hêdî bi tunebûnê re rû bi rû dimînê. Ev jî dibe sedema nexweşiya parkînsonê.

**Nîşanên parkînsonê ev in:**

- Lerizîn (Tremor)
- Hişkî (Rîjîdîte)



- Kêmbûna tevgeran (Bradîkînezî)
- Bêhevsengî, rûxandina hevsengiya laş (Postural Instability)
- Astengiya daqurtandinê (Dyspha gia - Dîsfajî)
- Pirsgirêkên mîzdankê
- Bêhntengî/tengezarî
- Axaftina neherikbar û nefambar
- Rûyekî sar, mirûzekî nexweş
- Piştxûzî (kîfoz)
- Pirsgirêkên xewê

Mûhammed Alî (werzîşvan), Adolf Hîtler (nijadperest), Bulent Ecevit (ramyar), Anna Neagla (stranbêj), Francisco Franco (nijadperest), Jean Paul (Papayê 2.) hinek kesên navdar in ku bi parkînsonê ketine.

Parkînson, nexweşiyeke demdirêj e. Hêdî hêdî pêşve diçe. Bi tevayî ji holê ranabe. Rêbazên heyî ji bo rawestandin an jî jiholêrakirina encam û nîşanên nexweşiyê ne. Ji bo vê jî li gor rewşê derman, nojdarî yan jî fîzyoterapî tê pejirandin.

Nexweşîya parkînsonê her ku diçe tevgerê asteng dike. Ji bo xurtkirina masûlkeyan û jiyaneke bitevger fîzyoterapî pir girîng e.

Parkînson, li ser rewşa derûnî jî encamên neyînî pêk tîne. Tengezarî (depresyon), xeyal/leylan (halûsînasyon), tewşikî (hezeyan) bandora xwe li nexweşan dikin. Ji ber vê yekê di pêvajoya başkirina nexweşan de hevkariya bijîşk, fîzyoterapîst, derûnnas û malbatê girîng e.

Bi pandemiyê re gelek nexweşên parkînsonî neçar man ji malê dernekevin. Bi vî awayî bêtevgerî jî bû beşeke jiyana wan. Ji ber bêtevgeriyê jî laşên gelek nexweşan hişk bûn, xwar bûn û masûlkeyên wan lawaz bûn. Encamên nexweşiyê giran bûn. Pirsgirêkên derûnî derketin asta herî jor. Ji bo encamên giran ji holê rabin divê pispor malbatê di der barê parkînsonê de agahdar bikin. Divê malbat, di serdema malê de ji bo




nexweşan di liv û tevgerê de be. Bi awayekî bi rêk û pêk bikaranîna dermanan û egzersîz ji bo encamên giran dernekevin du rêbazên sereke ne.

Bi hêviya jiyaneke bitendurist û bêpandemî...



# Ez û navê xwe

Xelata Omerî

Beriya demekê min di medyaya tirk de dît ku wan li ser halterciyê xwe Naîm Suleymanoglu (Naum Sulejmanov) filmek çêkirine. Haltercî bi eslê xwe ji turkmenên Bulgaristanê ye. Di vê dokumenterê de, neheqî û çavsoriya li wî û malbata wî dibe, ji me re diyar e. Mirov nikare empatiya xwe ya bi Suleymanoglu re veşêre. Îca, tiştê ji Naîm Suleymanoglu re xêr e, ma ji min re qebehet e!

Ma ne jixwe gotineke pêşiyên kurdan heye ku dibêje: "Şûjina di çavên xwe de nabîne lê derziya di çavên xelkê de dibîne!"

Li cem kurdan her tiştekî xweş û geş dibe nav. Navê min jî Xelatê ye. Çîroka navê min dûr û dirêj e. Ger mecal rê bidin êz ê li pêş behsa vê serpêhatiyê ji we re bikim. Îca bapîra min ya mezin Eyno ev nav li min kiriye. Wateya navê min ev e: Kengî mirov karekî baş bike an jî di mijarekê de bi ser keve, wê çaxê xelatan bi mirov ve dikin.

Hin wateyên din yên Xelatê hene. Navçeya Xelatê, li Serhedê, navçeyeke nêzîkî Gola Wanê û bi ser bajarê Bedlîsê ve ye. Di wêjeya kurdî de, Xelat bi sêvên xwe navdar e û ji Çiyayê Sîpanê re bûye mazûban! Ne bi tenê warê pezkovî, lê her wiha serpêhatiya Xecê û Siyabend li Sîpanê Xelatê rû dide. Xecê û Siyabend ji bo kêf û seyranê, xwe li çiyayê Sîpanê Xelatê digirin. Her dengbêj strana Xecê û Siyabend bi stîla xwe dibêje. Ma kî dikare wek Îsa Berwarî deng bide vê bûyerê?

Çaxa kurd ji herêmekê hez bikin, kêfa wan ji kesekî/ê re bê, navê mezin an navdarên xwe hildidin, navên van li zarokê xwe dikin. Ez nizanim gelo pîrika min Eyno ev agahdarî dizanîbûn an na. Bi qasî ku ez dizanim, navê hogirek ji yên kalikê min Bedirxan, Xelatê bû. Loma jî pîrika min Eyno ev nav li min kiriye.

Rojekê diya bavê min Şikriya bi destê min girt û ez birim cem karmendê nifûsê yê dewleta tirk. Karmendê nifusê navê min yê Xelatê qebûl nekir. Li gor wî ev nav ne bi tirkî bû û loma jî li belgeyên dewletê nenivîsî. Û karmendê dewleta tirk, navê min li şûna Xelatê, binivise Hediye ya erebî nivîsî. Mîna Naim Suleymanoglu min şîmaqeke ku ez ê ji bîr nekim xwar.

Hûn dibînin, neheqî ne tenê li Suleymanoglu bûye, çavsorî li Xelatê û yên wek Xelatê û li kulîlka Sîpanê jî bûye. Hal ew e ku, hilbijartina navên xwe, di peymanên navneteweyî de mafekî mirovan ê rewa ye. Ji roja ez bi xwe hisiyam û heta îro, her cara navê min bûye mijar, min ji dor û berê xwe re, nemazê ji xwişk û birayên xwe re gotiye: "Heyran ji min re nebêjin Hediye, ez Xelatê me!"

Gul û kulîlkên li şaneşînên xwe, neçilmisînin!

# Gel bi êrîşên dijwar têk naçe

Halîl Kanak

Hemû şerên li ser rûyê erdê diqewime sûcên mirovahiyê ye. Tu mafdar bî an jî ne mafdar bî, ev ne girîng e. Di encamê de li dijî mirovahiyê sûc pêk tê. Lê di heman demê de her şerek exlaqekî xwe heye. Mînak, di exlaqê şer de tu nikarî malên gel hilweşînî, tu nikarî komkujiya li ser ajelan pêk bînî. Yan jî tu nikarî jinan qetil bikî, zarokekî bêziman ê wekî Mîhraç bi awayekî hovane bikujî. Lê hezar mixabin komara ku em lê dijîn para xwe ji exlaq, hiqûq û mirovahiyê negirtî ye.

Ev komar bi dehan sal in li dijî nasnameya kurd şerekî bêpîvan û bêsînor dimeşîne. Em baş dizanin ku bûyera di şexsê Mîhraç de ku li Hezexê pêk hat rasthatinek nîne. Gava em li dîrokê dinêrin rastî zelaltir dibe. Zarokên wek Ugur Kaymaz, Ceylan Onkol û Nîhat Kazan jî di bîra me hemûyan de ne.

Li gor ragihandina saziya mafê mirovan di navbera salên 1988-2013'yan de tenê 569 zarok hatin kuştin. Tiştekî balkêş e ku piraniyê kujerê wan zarokan nehatin darizandin jî. Ma gelo ev rasthatinî ye. Bêguman na! Li gor vê hişmendiyê zarok, jin, ciwan, pîr ne girîng e. Heger tu kurd bî cihê te goristan e.

Divê bi taybet hin tiştan em ji bîr nekin. Mînak, bûyera Haci Lokman Bîrlîk. Ev bûyer, bûyerek ji rêzê nîne. Qetilkirina Haci Lokman Bîrlîk peyameke girîng bû ji bo gelê kurd. Dibêjin ku heger ciwanekî kurd serî hilde wê encama wî wisa bibe. Yan jî tu jinek berxwedêr bî encama te wê bibe mîna Ekîn Wan. Heger tu dengê xwe derxî li Roboskîyê laşên we ew ê parçe parçe bibin. Tevahî rê û rêbazên li dijî mirovahiyê bi kar anîn. Bi rêbazên dagirkeran bi tank û topan bajarên me hilweşandin. 20 sal berê gundên me dişewitandin, îro jî bajarên me xera dikin. Bala xwe bidin daristanên li Kurdistanê dişewitînin. Dijbertiya vê komarê tenê ne li hember kesayeta kurd e, xweza û erdnîgariya me jî ji bo wan 'xetere ye'.

Rastî ew e ku ev komar cesaretê ji bêdengiya gelê kurd digire. Li ber çavên cîhanê bi sedan pêşeng û siyasetmedarên me avêtin zindanan. Bi dehan rewşenbîrên me şandin sirgûnê. Ji bo bêdeng bibin, bi hezaran gelê me li çar aliyê cîhanê kirin penaber. Lê ev gengaz e? Ma çawa gengaz e ev agirê azadiyê vemire? Gelek desthilatdaran zimanê xwe bi dora devê xwe xistin û ketin nav xeyalên pûç. Xeyalên vî desthilatdarî jî ew ê vala derkevin. Dîrokê aşkera kir ku ev gel bi tirs û xof, bi êrîşên dijwar û bi zextên bêpîvan têk naçe.



# Hîkayeya ziwano nêzanayene



Av. Cemile Turhalli






Yew ziwan bîyarêne vîrê xo. 3 hezarî ra zêde merdimî no ziwan qalî kenî û hezaran km de cuyenî. No ziwan de bi hezaran çekuyî estî û kitabî yenî nusnayîş. No ziwan vengê xo rengê xo no tebîetî ra girewto. La nêeşkeno texma xo û rengê xo bido tebîet.

Ziwan seba dar o. Na dare ça de awe bivîna ristimê xo weyrê ra derg kena. Çend ristimê aye pîl bibî, gilê aye zî derg benî. Dar bi kokê xo û bi gilê xo bena dare. Ziwanê ma zî seba na dare bi ristimê xo û bi gilê xo pîl bîya, vil girewta û bezreyê xo vilayê her cayî kerda. Şima eşkenê na dare ra vajîme ristimê xo fek vera de, gilanê xo derg mekere û bezrê xo vila mekere. Şima helbet eşkenî vajîme. La tewr vernî ganî şima vernîya çimanê awe zuwa bikerî û vernîya tîje padî. Eger şima eşkenî înan bikerî o wext şima eşkenî nêverdî ke dare pîl biba.

Şima eşkenî çîyek bin zî bikerî. A zî şima dare bibirnî. La şima dare bibirnî zî şima nêeşkenî bezreyê dare vînî bikerî. Çimkî yew dare ra mîlyaran bezrê/toximî virazîyenî. Yew toximî ra hona zî yew dare virazîyena. Aye ra şima se bikerî nêkerî, dare timî bi xo sero ya. Dare mîyanê na xozaye de ne lez qir bena û ne zî vînî bena.

Ziwan seba dar o. Nasnameyê merdiman o. Ziwan nameyê xo qalkerdişê merdimanê xo ra gêno. Nika zafinan nameyê xo ziwanê netewa xo ra gênî. Helbet netew tena ziwan ser o nêno fehmkerdine. Netew bi kultur, bi ziwan, bi fikir, bi bawerî û bi folklorî virazîyeno. Nê heme seba gilê dare yî. Gilê daran çendêk derg bibî, versî/sîya xo danê erd. Dinya aye semed honik bena.

Heta nika bi mîlyonan merdimî ziwanê ma qalî kerdî. Mîlyonan merdimî veyveyanê xo ra bigêrêne heta şînanê xo bi kulturê xo no ziwan qalî kerdî. La yew roje de no mîrasêk pîl vînî zî beno.

Yew gede tewr vernî pîzeyê maya xo de veng eşnaveno. Semedê gede, no veng ziwano vernî yo. Bado ke ame dinya bi bermayîşe xo dinya de maneno. Ziwanê gede bermayîş o. La gede bermayîş ra pey ziwanê diyîne museno. O zî ziwanê maya ci yo. Ziwanê diyîne ra pey vera vera bermayîş vîrî keno. Êdî ziwanê diyîne ci rê beno ziwanê yewine.

Heta wextêk gede vano qey tena yew ziwan esto. O zî tena ziwanê ci yo. Ziwananê bînan eceb vîneno. Gede gege bi zerrîya xo ziwan museno û ge-ge zî bi zorî museno.

Cuya ma kurdan de ziwano diyîne hertim bi trajik ca girewto. O ziwan zî tirkî yo. Zafaneyê şarê ma bi zerrîya xo no ziwan nêmusayî. Ez heta nêşîyayêne mekteb mi tirkî nêzanayêne. Wextek ez şîya mekteb, mi zaf waştêne ke ez bi lez tirkî bimusa. Tewr zaf zî mi waştêne ez sondwendişê tirkî bimusa. Çimkî hewşa mektebî de her kes bi qîrayîş sondwendiş wendêne. Mi vatêne ez çendêk sondwendiş weş biwana, ez do lez tirkî bimusa. Çend aşmanê peyêan de ez tirkî musaya û êdî mi sondwendişî ra fehm kerdêne. La mi seyî sondwendişî ra fehm kerd, mi wendişê sondwendişî ra fek vera da. O çax mi fehm kerde ke no sond sondê ma nîyo. No sond fek veradayîşe ziwanê ma yo. Yeno mi vîrî ke ez bermayêne û mi waştêne ke ez erêy şêra mekteb û ez qet sond nêwana.

Ziwanê tirkî tarîxê komelê ma de û tarîxê heme merdimanê ma de qet cayêk baş de ca nêgirewto. Mehkemaya Îstiklalî de kesê 18 serrî ra qijî ameyî dardekerdiş. Çimkî goreyê dewlete kesê ke tirkî nêzanê faydeyê/havilê înan zî dewlete rê çinî yo. 70 serrî verê cû 50 roşnvîrê kurdan, semedê şîira Apê Musa "Şîira qimil" kewtî zîndan. Seba çi? Seba na şîîra kurdî. Çimkî na dewlete de yew ziwan esto. Vîşêrê no ziwanî sewbîna ziwanêk diyîne çinî yo. Ziwanê kurdî ê diyîne zî nêbeno. Ziwanê kurdî ziwan nîyo. Namê o zî çinî yo. Aye ra nêbeno diyîne zî.

Demê 12 Êlule de yew xortêk yeno qiseykerdine. Nameyî o xortî Kamber Ateşî yo. Kamber zîndan de yo. O tirkî zano la maya ci vîşêrê kurdî sewbîna ziwanêk nêzana. Gedêyê bînî, maya xo ra vanî "Dayê Qemberî reyde bi tirkî qisey bike, eke ti kurdî qisey bikera leşkerî do ci bikuyî. Ganî ti tirkî qisey bikera". Dima ra maya xo musnenî nê vatişî "Kamber Ateş nasılsın".

Maya Qemberî şona zîndan, aye benî zerre û mahkuman anî înan ver. Mehkuman ver de yew leşker esto û destê înan de cop esto. Maya Qemberî û Qember ewnîyenê yewbînan. Çimê wirdinan zî benî de. Bade pey maya ey, ci rê vana "Kamber Ateş nasılsın?".

Lajê aye "Sağ ol anam benim, iyiyim ben, sen nasılsın?" û cewab dano. Maya ci nêzana no persî rê vaja se û bade pey hona vengê xo berz kena, bermena û vana " Kamber Ateş nasılsın?"

Lajê aye hona perseno vano "Sağol anam, ben iyiyim, sen nasılsın, babam nasıl, memleket nasıl?" û paweno ke maya ci cewab bida.

La maya Qemberî fehm nêkena û zerrîya aye qesyena nêzana se bikera û dima hona ewnêna lajê xo Qemberî û vana "Kamber Ateş nasılsın?" .

Doruverê înan de kam esto heme ewnenî înan û Qember û maya ci rê bermenî.

No se serre de hûmara meseleyê winasîyan ê kurdan bi hezaran ê. Serranê peyênan de kurd bi vengê mîlyonan kewtî meclis, şaradarîya pîlan û kijan girewtî. Bi hêzê xo seba dare kokê xo û gilê xo kerdî pîl. Nika zî ziwanê înan meclise de hema zî nîno qebulkerdiş. Zabitê meclise de ziwanê kurdan nêno zanayene. Zabitê meclise de kurdî "ziwano nêzanayene yo. (bilinmeyen bir dil)." Di hewte verê cû zî Zîndanê Elezîzî de cezaya deyîrê kurdî mahkuman rê ame dayîş. Seba ke no ziwan kurdî yo. Zabitan de wina ame nusnayene "... anlaşılamayan bir dilde halay çektikleri için disiplin cezasına çarptırılmaları..."

Goreba na dewlete ziwanê ma ziwanê diyîne, hîrêyîne û çarine zî nîyo. Goreba înan ziwanê ma ziwan nîyo. Çimkî nameyê ziwanê ma ziwano nêzanayene yo.

Mi verê cû destpêkê nuşteyî de zî va. Ziwanê maye sey dare yo. Seyî ke kesêk nêeşkeno vernîya tîje bigêro û vernîya çimanê awe bigêro û zuwa bikero, yew nêeşkeno ristimê dare û gilê dare zî bivindarno.

# Hîrê tepişteyê nêweşî qawişêk de yî

Endama Komîsyonê Zîndanan ya Komeleya Heqê Merdiman (ÎHD) Avukat Mehtap Serte tepişteyo nêweş Îsmaîl Tambogayo ke Zîndanê Tîpa Tyî yê Îskenderunî yê Hatayî de maneno reyde pêvînayîş pê arde. Tamboga pêvînayîş de qala şert û mercê ke tede maneno kerd. Tambogayo ke qawişê karantîna de maneno da zanayene ke qawişo ke cayê boydayîşî tede çinî yo de şertê fîzîkî tesîrêko xirab weşîya înan ser de virazeno.




Tamboga qala tepişteyo nêweş Siddik Guler, Bangîn Muhammedo ke di çaqeyê ci çinî yî û pê kursîya tekerlekin têgêreno û Hamîd Suleymano ke rojawayê Kurdistanî ra yo û tirkî nêzano kerd û vat: "Qawişo ke ma tede manenî de cayê boydayîşî û buzdolabî çinî yo. Çîyê ke ma kantîn ra herînenê xira benî. Ma bi destê xo kincanê xo şuyenî la cayo ke ma înan bidaliqnî çinî yo. Ma zerreyê qawişo teng de kincan rafînenê. Coka ra qawiş zêde bê hewa maneno. Seba ke problemê oksîjenî esto çermê bedenê ma de nêweşî vejîyaya. Di roje verê cû şekerê mi weriş û mi wedarnayî nêweşxane. Doktor mi rê mama nuşt la tena 6 rojan mama dayî mi. Nika seba ke mama nêdanî ez vêşan manena. Seba ke buzdolabî çinî yo her çî xira beno. Didanê mi şikiteyî û fekê mi îltîhap girewto."

Tamboga qiseykerdişê xo yê peyênan de qala embazanê xo yê qawişî kerd û wina vat: "Seba ke Siddik Gulerî zî berdî nêweşxane o zî ardî qawişê karantîna. Ma nêeşkenê lazimîyanê xo pê bîyarî. Seba ke ma derbazê qawişêk ke tede cayê boydayîşî û buzdolabî esto ma muracatê selahîyetdaranê zîndanî kerd. La cewabêk nêdayî ma û her ke şona rewşa ma hîna giran bena."

Avukat Serte zî vat ke tepişteyê nêweş wazenê heqê xo yê weşîye bixebetnî û domnaye: "Şertê tîya xirab î. Tîya de xeylê çîyî çinî yî. Cayo ke ma hewayo pake bigîrî çinî yo. Îsmaîl Tamboga timî qelibneno. Siddik Guler 81 serre yo. Bangîn Muhammedo astengdar zî înan reyde maneno. Lazimîya nê embazan bi ewnayîşê kesek bîn esta. Nameyê no tecrîd o. Îşkenceyo sîstematîk bi tepişteyanê nêweşan yeno kerdene." *HATAY*



# Tepişteyo nêweş: Beno ke no hewte xebera mergê mi bêro

Roj çina ke zîndanan ra xebera binpaykerdişê heqê merdiman, îxlalê heqan, qedexeyê pêvînayîşî û tedaya vera tepişteyan nêra. Nê zîndanan ra yew zî Zîndanê Şakranî yo. Tepişteyo nêweş Abdulhalîm Kirtayo ke Zîndanê Şakranî de yeno tepişte keyeyê xo reyde bi rayîrê telefonî qisey kerd û derheqê rewşa xo û rewşa tepişteyan de qesawetê xo ardî ziwan.

Tepişteyo nêweş û 73 serre Abdulhalîm Kirtay pêvînayîşê telefonî de kênaya xo Herdem Merwanî rê wina vat: ''Ez di rojî yo hucre de yena tepiştene û zaf nêweş a. Mi rê zaf zext kenê, beno ke no hewte şima rê xebera mergê mi bêro.''

Herdem Merwanî veng daye rayapêroyîye ke wa semedê pîyê ci û tepişteyanê nêweşan hîsgêrîye ramojnê.

Kirtayo ke 27 serran ra zafêr o ke zîndan de yo rixmo ke zaf nêweşîye ci estê ne yeno tehlîyekerdene ne zî yeno tedawîkerdene. *ANQARA*



# Ez ê çîrokek xweş ji we re binivîsim



Ez ê îro çîrokeke xweş bi we re parve bikim. Îro dîsa min rûpela xwe vekir û ez dixwazim bi şopînerên xwe yên Facebookê re çîrokeke xweş parve bikim. Hema çend deqeyan li hêviya min bin heta hinekî şarja telefonê tije bibe.

Lê ka hinekî bêhna xwe fireh bikin divê ez pêşî telefona xwe bixim şarjê ji ber hindik maye were girtin. Nabe ku ez çîrokê nîvco bikim û telefona min were girtin. Wiha be divê ez li benda elektrîkê bimînim, heta were ez ê telefonê bixim şarjê. Lê gava elektrîk were divê pêşî ez dînemoyê bixebitînim û ava qazana xwe dagirim ji bo wê jî gerek ez ji qata 5 an dakevim jêr dînemoyê bixebitînim.

Wiha be ez ê hinekî din dereng ji we re çîroka xwe binivîsim. Ya baş ez sozê nedim ku kengî ez ê bikaribim ji we re binivîsim. Gava elektrîk hat û min çû dînemo xebitand û ava xwe dagirt û telefona xwe şarj kir ez ê ji we re çîroka xwe binivîsim.

Lê tiştek din heye mîratê dema nû tê carnan wiha zêde û bilind tê ku alavên malê tevî dişewitîne, hema xwedê bistirîne û telefona min jî bi xwe re xera neke. Heke bê qeza û bela eletrîk hat û min ava xwe dagirt û telefona xwe şarj kir ez ê fincaneke qehweya xwe jî deynim ber xwe û ji we re çîroka xwe binivîsim.

Min behsa qehweyê kir hat bîra min ku cerê gaza me jî vala bûye. De tiştek nabe ez karim bi erebeya xwe Qamişlo serobino bikim û cerekê gazê peyda bikim. Lawo ez dibêjim Qamişlo serobino bikim lê hûn dizanin lîtreya benzînê bûye 1600 lîreyê Sûriyeyê. Nebêje waawo ...ez ji te re bêjim kîskê nan jî ku 5 nan tê de hene bûye bi 1500 lîreyê Sûriyeyê.

De heyra em çawa bikin ez nikarim sozê bidim we ku ez ê kengî bikaribim van tiştên min gotin tevan bikim û paşê ji we re çîrokekê binivîsim. Lê bi soz kengî em ew tev bê qeza û bela kirin ez ê çîrokeke xwe ji we re binivîsim......

***Macid Yûsif***

# Tiştanok (mamik)



**1-**Tiştek min heye
Dirêj e ne ben e
Gez dike ne kûçik e
Gelo ew çi ye?

**2-**Tiştek min heye
Mamê mino
Dirêj e ne mar e
Kej û hît e ne kar e
Serî hişk e ji dar e
Kî dizane ew çi ye?

***Çavkanî: Mamikên Botanê***
***Berhevkar: Rênas Xendekî û Dildar Botî***

Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine. Her wiha em dixwazin hûn ji kerema xwe tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkin E-maila rojnameyê da ku em wan jî biweşînin.

**Bersivên me ev in:**
1- mar 2- werîs, ben

# Zûgotinok

Îro dîsa di tûrikê me de çend zûgotinok hene û em ê dîsa bi we hêjayan re parve bikin.
De werin em dest pê bikin û pirsa xwe ya her tim bipirsin.


→ Gelo kî dikare 3 caran li pey hev bibêje:
**Darê min qul**
**Darê bavê min qul**
**Darê min ê qul**
**Di qula darê bavê min de**

→ Heke nikaribî wê bibêjî ka vê biceribîne:
**Dar kir kayê**
**Da dest dayê**

***Çavkanî: Zûgotinok***
***Berhevkar: Mihemedê Kurdo***



# XAÇEPIRS



**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

1. Dîn, No 3. Nefret, gir 5. Kurdên nemisilman 6. Peyam 7. Kêfxweş
9. Cihê ku genim û ka û pûşê xwe lê kom dikirin
12. Rewşenbîr û navdarekî kurd Ehmedê ...
14. Sewaleke kedî ji bo hirî û goştê wê tê xwedîkirin
15. Xelkê Urdunê 17. Pêşdaçekek
18. Ji bo 22. Umîdwar, bendewar

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Cînavkek di rewşa tewandî de
2. Xelkên Romayê
3. Cînavkek pirsyariyê
4. Bersiva neyênî
5. Daneke rojê
7. Govendeke kurdî li dawetên Rojava tê lîstin
10. Ji niha şûn de
11. Êl
13. Serhişkî
14. Nûjen
16. Stirî
19. Arvan
20. Kûçika mê
21. Agir
23. Notayeke mûzîkê

Bersiva hefteya borî



# Xan û malên kerpîç ên Rihayê

Bêrîvan Karatorak



Riha… Bajarê pêxemberan. Warê şaristaniyên qedîm, destpêka xebatên zanistî… Wexta mijar dibe bajarê Rihayê mirov dikare behsa gelek taybetiyên wê yên xweser bike. Gelek cihên wê yên kevnare hene. Yek ji wan taybetiyên wê yên herî bi nav û deng malên wê yên kevnar in ku ji kerpîçan hatine avakirin.

Xweza ne tenê ji çend daran an jî ji çend dilop baranê pêk tê. Xweza bi tena serê xwe hebûnek e. Di hundirê xwe de dihewîne gelek tiştên zanistî. Cihên ku birîn lê vedibin dîsa bi xwezayê bi derman dibin. Ax li xwe vedigere. Nû dibe, nûjen dibe û carinan jî dikeve dirûvekî din. Lê tim ji mirovahiyê re cihê jiyanê û berdewamkirinê ye.

Ku welatek bi çand û kevneşopiyên xwe dewlemend bûbe, bi saya xwezayê ye. Di xwezaya dewlemend de hilberîn hene, pêşketin hene. Ku jêderk tune be tiştekî ku were afirandin jî tune ye. Ji ber vê yekê ye ku di çand û kevneşopiyên kurdan de her tim şopên xwezayê rû didin.

Welatê Kurdistanê jî yek ji wan welatan e ku ji xwezaya xwe ya dewlemend sûd wergirtiye û xwezayê di nav çand û kevneşopiyên wê de bûye xwedî cihekî girîng.

Li Kurdistanê yek ji bajarên ku bi çand, kevneşopî û mîmariyên xwe yên dîrokî bi nav û deng bûye jî bajarê Rihayê ye. Mirov dikare bi rojan behsa her taybetiyeke bajêr bike. Lê taybetiyeke xweser heye ku divê bi girîngiyekê li ser were rawestandin. Ew taybetiya ku berê gelek serdêran dide xwe malên wê yên ji kerpîçan hatine çêkirin e.

Malên kerpîç ên Rihayê ne tenê ji aliyê çandî ve xwedî girîngiyekê ne. Her wiha ji ber ku li herêmê di dîrokê de gelek ji van malan hatine çêkirin di heman demê de mirov dikare wekî bermahiyên dîrokê jî pênase bike. Ev yek dike ku wateya li van malên kerpîç hatine barkirin berfirehtir bibe.

**Mîmariya hevpariyê ne ev mal**

Malên kerpîç ên ku bêhtir li herêma Heranê hatine avakirin wekî odeyên ku bi hev ve hatine girêdan hatine avakirin. Her malek bi du, sê, çar, pênc an jî bi zêdetir odeyan bi hev ve hatine girêdan. Her odeyek bi deriyekî fireh û nîvgiloverî derdikeve odeyeke din. Bi vî awayî hemû ode bi hev ve ne.

Di serdemên berê de, di her odeyekê de malbatek jiyaye. An jî her ferdekî ku zewiciye ji dêvla ji malê cuda bibe odeyek jê re hatiye veqetandin. Bi saya vê yekê malbat û xizm ji hev dûr neketine. Pêdivî bi tu malên din an jî bi dûrketinê nemaye.

Dengê kenê zarokên ku bi hev re dilîzin bilind dibe. Kî dizane zarokan çend lîstik afirandine di van malên balkêş de. Çend jinan derd û kulên xwe bi hev re parve kirine. Çend jin gihîştine hewara hev. Çend dengbêjan bi dengê xwe yê qedîfe dilê welatiyan geş kirine di van malan de.

Ji ber ku di serdemên berê de elektrîk tune bûye malên ku hatine avakirin jî li gor wan şert û mercan hatine avakirin. Di banê malên ku serê wan wekî qubbeyekê hatiye avakirin de qulek hatiye hiştin. Bi saya vê qulê hem tîrêjên rojê dikevin hundir û ode ronî dibin hem jî hewa an jî dûye di hundir de derdikeve derve.

Malên kerpîçî bi dirêjiya xwe digihin heta pênc metreyan. Malên ku di avakirina wan de bêhtir kerpîç tê bikaranîn ji ber ku li herêma Rihayê dar hindik in, banê wan bi tuglayan hatine avakirin. Di serê her malekê de bi qasî hezar û pênc sed tugla tên bikaranîn. Banê wan jî ber bi jor ve teng dibin û wekî qubbeyekê xuya dibin.

**Dewsa vê çandê xalî maye**

Dîroka van malên kevnare her çiqas nehatibe zelalkirin jî tê zanîn ku li herêmê bi sedsalan di van malan de hatiye jiyîn. Ji ber tiştên ku di xerca malan de hatine bikaranîn havînan hundirê malan hênik e û zivistanan jî germ e.

Ji dîrokê heta roja me mirovahî di pey lêgerîna stargehekê de bûye. Ji ber vê yekê bi derfetên heyî hewl dane ji xwe re malên baş ava bikin. Di wan serdeman de tenê ax, av û ka hebûye û li gor van tiştan xerca malan hatiye çêkirin. Her çiqas ji bo qayîmkirina xercê li hin deveran rûnê gulan û sipîka hêkê hatibe bikaranîn jî li hemû herêman ev derfet tune bûye. Lê belê li her herêmekê ka, av û ax hebûye. Ji ber vê yekê tiştên herî girîng ên ji bo xercê ka, ax û av e.

Da ku malên kerpîçî demeke dirêj li ser piyan bimînin ya girîng ew e ku guhdanek ji wan re divê. Pêwîst e ku serê du-sê salan carekê xerca wê ya aliyê derve were nûkirin ku mal zû bi zû hilneweşe.

Her çiqas xerca kerpîçê wekî bêderfetiyekê were pênasekirin jî gelek feydeyên vê xercê hebûne. Li gel parastina mirovan a ji avhewaya dijwar, wekî xwedîlêderketin û parastina xwezayê jî mirov dikare pênase bike. Xerca kerpîçê ji xwezayê tê û bi tu awayî zerarê nade xwezayê. Li gel vê yekê xerc piştî hilweşandina malan dîsa tê bikaranîn. Xweza li xwezayê vedigere. Dirûv diguhere xweza lê dîsa jî vediguhere eslê xwe.

Di roja me de malên kerpîçî nayên bikaranîn êdî. Lê hem wekî nîşaneyeke dîrokê hem jî wekî parastina çanda kurdan malên kevnare yên kerpîçî tên parastin û wekî çand û kevneşopiyeke kurdan tên nîşandan. Tenê ji ber dîtina van malan jî be salê bi hezaran serdêr berê xwe didin herêma Rihayê.

Bi serbilindiya dîrokê, bi dilrehmiya xwezayê û bi hewldanên kurdistaniyan malên kerpîçî dibin rengekî welat û hem di bîra welatiyan de hem jî di rûpelên dîrokê de wekî çand û kevneşopiyeke xweser a kurdan cihê xwe digire.

# Berê bi tonan îro bi heban têne firotin

Navenda Nûçeyan

Dema Amed tê gotin Sûrên Amedê û Zebeşên Amedê tên bîra mirov. Yek ji sembolên Amedê jî zebeşên Amedê ne. Di aliyê çandiniyê de Amed bi zebeşên xwe navê xwe li cîhanê belav kiriye. Lê îro dema em dinêrin, zebeşên ku berê bi sedan tonan dihatin firotin, îro bi heban têne firotin.

Bi taybetî li Kurdistanê, ji ber ku şîrketên sermayedaran bi destûra dewletê mudaxeleyê xwezayê dikin êdî gel nikare ji xêr û bera xaka Kurdistanê sûd werbigire. Ji ber kanên madenê û bendavên têne avakirin, axa bibereket tev wêran dibe. Ji ber vê yekê jî şertên çandiniyê namînin. Li Amedê jî ji ber bendavan êdî cotkar û rênçberên berê zebeşên Amedê diçandin wekî berê nikarin biçînin.

**48 sal in zebeşan difiroşe**

Kal û pîrên me dema qala berê dikin, dibêjin berê tiştên ku li vê axê çêdibûn, li tu deverê tune bûn. Ji ber polîtîkayên dewletê yên li dijî cotkar û rênçberan êdî wekî berê zebeşên Amedê nemane. Ji ber zebeşê Amedê êdî li ser dezgehan tune, dema mirov zebeşên Amedê dibîne, ev zebeşên mezin û belek balê dikişînin ser xwe. Îsal em tenê li cem zebeşfiroşê ku li ser Rêya Rihayê holika xwe daniye û zebeşan difiroşe rastî zebeşên Amedê hatin. Têkildarî mijarê em bi zebeşfiroş Şêxmûs Malkoç re axivîn.


**'Keda me di bin avê de dihêlin'**

Şêxmûs Malkoç diyar kir ku 60 salî ye û ji 12 saliya xwe heya niha karê çandiniya zebeş û petêxan dike. Malkoç, ji gundê Simaqî yê girêdayê navenda Amedê ye û li gundê Simaqê bostanên zebaşan datîne. Malkoç, li ser rewşa zebeşan axivî û wiha got: "Berê çem hebû. Me kortik dikolan û çandiniya zebeşan dikir. Lê piştî avakirina bendavê êdî tu sûda axê nema. Erdên me di binê bendavê de man, ji ber vê em nikarin li vir çandiniya bostan bikin."

Malkoç bal kişand ser xeteriyên li dijî çandiniyê û wiha axivî: "Niha avê di heman astê de bernadin. Heke av di heman astê de bihata berdan, me dê niha jî karibûna çandiniyê bikira. Lê rayedarên bendavê avê di careke de berdidin. Ji ber vê yekê bostanên me di bin avê de dimînin. Hemû keda me di bin avê de dihêlin."

**'Ew tehma berê nemaye'**

Şêxmûs Malkoç da zanîn ku heya bendav tunebûn hemû gundiyên Simaqiyê bi çandiniya bostanan eleqedar dibûn û wiha berdewam kir: "Me hemûyan debara xwe bi vî karê dikir. Lê niha kesên ku nikarin vî karê bikin çûn metropolan bi cih bûn. Berê dema me çandiniya petêxan dikir petêxên me ji hingiv şêrîntir bûn. Dema me dixwar pêçiyên me bi hev ve diman. Ji ber tehma zebeş û petêxan navê Simaqiyê li her derê belav bûbû. Lê niha em mecbûr dimînin ku gubreyê bidin, ji ber wê ew tehma berê nemaye. Wan bi bendava sineatê me herimandin."



**Heb bi heb tên dîtin**

Malkoç zebeş û petêxê cuda yê li ser dezgeya xwe nîşan dide û wiha pê de çû: "Ev zebeşê ku rengî wî ji yê din cudatir 'zebeşê surme' ye. Ji ber ku qalikê wî qalindtir e û zû xira nabe, buhatir e. Em wî bi kîloyan nadin bi heban difiroşin. Heba wî li gor mezinbûna wî diçe heya 500 lîreyî jî. Ên ku bixwazin elbet dikarin toximê wan bibin deynin. Lê di esasê xwe de ew zebeşê Simaqiyê ye. Petêxên zer ji wan re 'petêxên zerik' tên gotin. Berê li cihê bilind dadileqandin û zivistanê dixwarin."

Zebeşfiroş Şêxmûs Malkoç bal kişand ser bandora bendavên ku hatine çêkirin û wiha bi dawî kir: "Berê her du aliyên çem jî hemû zebeş û petêx bûn. Ji Binê Qeya bigire heya Çiyayê Spî Simaqiyan bostan diçandin. Me toximê çend petêxên xwe jî winda kir. Yek ji wan jî petêxê berîkê bûn. Biçûk bûn. Tehma wan û tu petêxî ne yek bûn. Lê ji ber ku êdî kes wek berê vî karê nake ew toxim jî neman."

xwebûn
13-19 Îlon 2021 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 91

*İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:* Kadri Esen
*Sorumlu Yazıişleri Müdürü:* Elif Can Alkan
*Yayın Danışma Kurulu:* Abdulla Peşêw
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco
*Yayın Türü:* Haftalık Yaygın Süreli
*Yönetim Yeri:* Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 *Yenişehir / Diyarbakır*
*Baskı:* Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı *Bağlar / Diyarbakır*

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

# Kurdên cîhana dêrîn; hattî-hîtîtî 5



Keştiya Alalû
Agît Yazar

... Keyayên hîtîtiyan şerên xwe jî aştiyên xwe jî nivîsandine; parastina mafên mirovan, birêvebirina civakê, parêznameyên xwe yên siyasî yên li hemberî Civata Rîsipîyên Pankûyê, cezayê mirovên tawanbar, bi awayekî qethî qedexekirina zewaca ensest û zewaca zêdeyî jinekê û împaratoriya wan a dêwasa ya federatîf ku ji 21 welatan pêk dihat jî nivîsandine...

Cejn, şîn û şahî, dia û dîroz, govend û dîlan, tenbûr muzîkjenî, şano û hunera pêşandanê jî nivîsandine. De vêca hem nivîsandine û hem jî wêneyên wan li ser taqên lat û zinaran qewartine...

Nivîsandine; her nivîsandine. Hem jî bi zimanê me yê şîrîn nivîsandine û bi vî awayî taaa nêzî çar hezar sal berê, wan hîmê zimanê Hînd-Ewrûpayê danîn û ji alema cîhanê re selimandin ku zimanê me, qurmê zimanê Hînd-Ewrûpayê ye.

Her îcraetên xwe, bi destên katibên hosteyên jîr, yên hûrrî, lûwî, hattî û hîtîtî qeyd kirine û ji dûhatiyên xwe re arşîveke bêqisûr hiştin. Arşîva wan ew çend tekûz e, di roja me de jî gelek dewlet hîn jî negihaştine asta hîtîtan. Çanda wan, demokrasiya wan ewqas pêşketî bûye, heta mafê koleyan jî bi zagonan hatiye misogerkirin. Kesên tawanbar jî xwedî maf bûne û tu caran cezayê rûmetşikîner li wan nebirîne.

Di şerên xwe de jî xwediyê pîvanên însanî bûne. Biryara Civata Rîsipiyan, di ser ya Keyayên Hîtîtan re bûye. De vêca hesab li ba we ye! Civaka kurd, heta niha jî hemû şêl, tore û tevgerên pêşiyên xwe yên hattî-hîtîtî di qarekterê xwe de dihebîne û heta tu bivê bi pîvanên wan yên homanîter ve girêdayî ne.

Gava min dest bi rêzenivîsa 'Kurdên cîhana dêrîn: hattî-hîtîtî' kir, pêşbîniya min ew bû ku ez ê bi 3-4 beşan bi dawî bikim. Çi digereee! Ez wa hîs dikim ku navika min bi paytext Hattûşayê ve hatiye girêdan. Nola destek ji nava mijê dîrokê dirêj bibe û bi pêxîla min bigire, bibêje 'gunehê me di hustuyê te de be, ger heta ji te tê û heta qelema te dilive, tu jiyan û serpêhatiyên me hattî-hîtîtiyan ranegihînî neviyên me yên niha jê re dibêjin kurd. Da ku li mîrateya me xwedî derkevin. Yana na, ew ê heta hetayê di bin nahleta nîrê bindestiyê de binalin.'

Ev serpêhatî û wesiyeta kurdên cîhana dêrîn, ya pêşiyên me hattî-hîtîtî yên jixwehez, jixwerazî û tu kes di ser pozê xwe re nedîtine.

Qasid, êrî û bêrî ye!

**Serpêhatiya keyayên hîtîtiyan**

Di vê xelekê de ez ê lîsteya navê keyayên hîtîtiyan li ber çavan raxînim, paşê jî ez ê qala hikumkariya keyayên bihişmet û efsanewî bikim. Keyayên mîrnîşîna kevn û mîrnîşîna gewre. Her wiha hilhatina roja Împaratorîya Hîtîtî û çûyina wê ya ava.

*Serdema mîrekiyê ya hîtîtan:*

Pîthana yê ji Kûşşarayê ....? Anîttayê ji Kûşşarayê ....? Tabarnayê ji Kûşşarayê .....? Ev her sê keya, dîroka wan baş nayên zanîn. Lê her sê keya, bav, kur û neviyên hev in û ji binemaleke hûrrî ya Zagros-Torosê ne (lêkolînerên tirk, bi zanebûn dixwazin xeleka di navbera Hîtît, Hattî û Hûrriyan de, ji hev biqetînin. Lê ev di nezera kurdan de, keftelefteke bêhûde ye)

Kûşşara, paytexta wan a destpêkê ye û li vî bajarî sîx li per û baskên wan dikevin û bi firê dikevin.

*Serdema mîrnîşîna dêrîn:*

Hattûşîlî yê 1'ê/Mûrşîlî yê 1'ê/Hantîlî yê 1'ê/Zîdanta yê 1'ê/Ammûna /Hûzzîya yê 1'ê/Telîpînû/Allûvamna/Hantîlî/Zîdanta yê 2'an/Hûzziya yê 2'an

*Serdema mîrnîşîna gewre:*

Tûthalîya yê 2'an/Arnûvanda yê 1'ê/Hattûşîlî yê 2'an/Tûthaliya yê 3'an/Tûthaliya yê ciwan(?)/Şûppîlûlîûma yê 1'ê/Arnûvanda yê 2'an/Mûrşîlî yê 2'an/Mûvatallî/Mûrşîlî yê 3'an/Ûrhî Teşûp(?)/Hattûşîlî yê 3'an/Tûthaliya yê 4'an/Arnûvanda yê 3'an/Şûppîlûlîûma yê 2'an

Rengdêra keyatiyê ya hîtîtan, Tabarna bû. Çawa dibêjin qral, lord, şah, keya, sultan û hwd. Tabarna, di heman demê de tê wateya 'keyayê mezin' jî. Her wiha Tabarna, tê wateya 'roja min' jî. Roja min, hîtaba keyayan e. Wek nimûne: Tabarna Hattûşîlî/Mezin Hattûşîlî/Roja min Hattûşîlî.

Hema hema di hemû mohrên keya û keybanûyên hîtîtiyan de, sêwirandina roja bibask heye. Alaya pêşiyên kurdan yên Mîtannî jî, roja bibask bû. Wekî tê zanîn, mîrnîşîna Mîtannî, hevçaxê mîrnîşîna Hîtîtî ye. Her wiha ev roja bibask, nîşana baweriya Zerdeştiyan e jî. Gelekî balkêş e. Niha jî kurd, pêşengên xwe wekî 'roja me, roja min' dihebînin û pênase dikin.

Dîsa jî di nava hîtîtan de rengdêra keybanûyan jî 'Tavanana' bû. Ev jî dihat wateya 'keybanûya mezin', an jî 'roja min'.

**Keya Hatûşîlî yê 1.**

Hattûşîlî yê 1. (B.Z. 1660-1630) keyayê hîtîtiyan yê yekemîn e ku ji mîrekiyê derbasî mîrnîşîniyê dibe. Navê Hattûşîliyê pêşîn nayê zanîn. Di nivîsên mîxî de tenê jêre gotine Tabarna. Min li jorê wateya Tabarna anîbû ziman.

Keya Hattûşîlî, di destpêkê de keyayê Kûşşarayê bûye. Tê texmînkirin Kûşşara, li nêzî Kanîşê ye (dibe ku Kanîş bi xwe be jî) Kanîş, nêzî Qeyseriyê ye. Di serdema Hîtîtan de jî jê re digotin, Kanîş. Ev nav ji 'kanî'yê tê. Îro jî kurd vî navî bi kar tînin. Kûşşara/Kanîş, di wexta xwe de navenda bazirganiyê bûye. Lema heta niha jî, mirovên Qeyserî, ji bazirganiyê re şareza ne.

Digel Anîtta yê pêşiyê Hattûşîlî, Hattûşa wêran kiribû û nifir lê kiribû jî dîsa jî Hattûşîlî yê Kûşşarayî, paytextê ji Kûşşarayê radike dibe Hattûşayê. Ji bo dilxweşiya niştecihên xwediyê Hattûşayê, navê xwe dike Hattûşîlî. Ango tê wateya 'êdî ew mêr ji Hattûşayê ye'

Tabarna/Keya Hattûşîlî, Hattûşayê ji nû ve ava dike. Eyan beyan gelekî aşkera ye ku xelkên hattî û hîtîtî heman milet in. Lewra Hattûşîlî di kevalekê de dibêje: "gava min Hattûşa vegirt, min kesek mişhet nekir; min dayikên wan wekî dayika xwe, bavên wan jî wekî bavê xwe pejirand."

Piştî hingê di demeke kurt de Keya Hattûşîlî, civatekê ava dike. Navê wê civatê datîne 'Civata Pankû' yê. Di hin cihan de wekî 'Civata Pankûs'ê jî derbas dibe. Avakirina vê civatê, bûye hîmê bingehîn ê avakirina pergala demokrasiyê.

Piştî keya Hattûşîlî, tifaq û aramiya navxweyî ava dike, vêca derdikeve seferê û sînorê mîrnîşîna xwe firehtir dike. Çemê Firatê derbas dike. Xwe berdide jêr, heta Karkamîş û Halpa/Helebê diçe. (Ev her du navend, di her serdemê de du navendên pir girîng in. Nexasim Karkamîş/Gir-gamêş, di dema pêş de dibe paytexta duyemîn a hîtîtan) Paşê dadikeve delavê Deryaya Spî.

Keya Hattûşîlî 30 sal li ser text dimîne. Keyayê gewre êdî kal e, hem jî kalekî bêhal e. Bavê gelek kur û qîzan e. Neviyên wî jî çêbûne. Lê Keya Hattûşîlî ji zarokên xwe ne razî ye. Keç û kurên wî, nelirêtî û bêemriya wî dikin.

Keya Hattûşîlî, Tûhkantî/mîrze (tûhkantî, di wateya dûhatî, ango mîrze dihat bikaranîn. Jixwe kurd îroj jî dibêjin 'dûhatî' Tûhkantî/Dûhatî) kur û keça xwe ya bêxêr, sergum dike. Di şûna kurê xwe yê mezin de, nevîyê xwe Mûrşîlî yê zarok, wekî mîrze/welîaht ji giregir û rîsipiyên Civata Pankû yê re radigihîne. Ev hem parêzname, hem jî wesiyetnameya siyasî ya yekemîn a keyayekî ye.

Keyayê gewre Hattûşîlî, bi dilnizmî û heta te divê bi zimanekî rengîn û ew çend jî wêjeyî, parêzname û wesiyetnameya xwe ji esilzadeyê Civatê/Meclisê ya Pankû yê re radigihîne. Parêzname û wesiyetname gelekî dirêj e. Lê ez ê tenê beşekî pir kurt jê pêşkêş bikim

Keyayê gewre, deng li koma giregir û esilzadeyan kir: "Bînêrin ciwanmêrno! Ez êdî kal im û nexweş im. Min ji we re navê Tabarna (keya) yê ciwan ragihand (qala kurê xwe yê mezin dike). Lê wî çer kir? Li gotinên min guhdar nekir. Çû guh da wê diya xwe ya mahra axudar/jehredar. Ev qet nayê qebûlkirin. Çi mirovekî sirrtahl û dilkevir e! Bêwijdanê bêîman! Çawa meriv bi gura bavê xwe neke... Paşê min ew da li ber lêpirsînê. Niha êdî ew ê çawa be?... Ji niha pê ve tu kes nikare ji biraziyê wî (Mûrşîlî yê 1. û nevîyê Hattûşîlî) re bibêje ev zarok e. Li diya xwe ya zimanjahr guhdarî kir. Xwişk û birayên wî gotinên fesadî ji wî re birin... Êdî ew ne kurê min e. Oreora diya wî ye, nola çêlekekê diore..."

Ji van gotinên Keya Hattûşîlî yên gazinbar diyar e ku zarokên wî ew kezebreşî kiriye. Lê ew ji rastiyê nayê xwar û heta dawiyê li hemberî nelirêtiya keç û kurên xwe li ber xwe dide. Pêş de, di gilînameya xwe de qala keça xwe ya pîresêr dike, dibêje:

"Ez bi wê re peyivîm. Got hindik e! Ha min pez, mal û milk zêde da wê, ha min xwîna miletê xwe mêt... Keça min, leke anî li ser navê min..."

Bi rastî jî ev helwesta Keyayê Gewre Hattûşîlî ya li hemberî nelirêtiya keç û kurê xwe, hêjayî wesifên giran e (hêvîdar im sergel û serkirdeyên kurdan yên vê serdemê, şîreta xwe ji vê helwesta şîrhelalî ya keya Hattûşîlî yê gewre bistînin)

Keya Hattûşîlî yê gewre, bang li giregir û rîsipiyên Civata Pankûyê jî dike û wan hişyar dike, dibêje:

"Binêrin ha! Nebe nebe hûn ji bo berjewendiyên xwe yên takekesî, bibêjin çawa be ev (Mûrşîlî) nevîyê min Mûrşîlî hîn zarok e û wî bi kar bînin!"

Bi rastî Keya Hattûşîlî yê gewre, heq dike ku meriv bejna xwe jê re bitewîne.

Keyayê bîrbir, mafparêz, zanamend û feylezof, vêca deng li wêrisê textê xwe, nevîyê xwe Mûrşîlî yê xortik dike û wesiyet dike, dibêje:

"Ger tu şîretên bapîrê xwe ji xwe re hilînî, tu yê nanê xwe bixwî, avê vexwî. Ger tu mezin bûyî, rojê sê dana bixwe û vexwe; li siheta xwe baş miqate be. Ger tu kal jî bûyî, vêca tu çi vedixwî vexwe"

Û wesiyeta Hattûşîlî ya Kezebsotîner û ew çend jî janbar a tewra dawî wiha ye:

"Termê min wekî tê zanîn bişon! Min hembêz bikin, ber bi sînga xwe ve biguvêşe û wanî min defin bike"

***(dê bidome)***







